

T.C.
ZANÎNGEHA YUZUNCU YIL
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BİLİND

TRANSKRÎPSİYON Û VEKOLÎNA KİTAB-U AHMEDIYE'YÊ

Zeydîn GÜLLÜ

Şêwirmend

Prof. Dr. Mehmet Zeydîn YILDIZ

WAN-2019

T.C.

VAN YUZINCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

KITAB-U AHMEDIYE’NİN TRANSKRİPSİYON VE ANALİZİ

Zeydin GÜLLÜ

Danışman

Prof. Dr. Mehmet Zeydin YILDIZ

VAN-2019

KURTE
Zeydin GÜLLÜ
TRANSKRÎPSİYON Û VEKOLÎNA KITAB-U EHMEDIYE'YÊ
TEZA LÎSANSÂ BILIND
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YIL
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
Şêwirmend: MEHMET ZEYDÎN YILDIZ
2019, Wan. IX + 162 r.

Ferhengên menzûm di edebiyata rojhilatî de xwediyê kevneşopiyek kevn, berfireh û berbelav in. Di civaka Ereb, Faris, Tirk, Peştû, Belûcî û Kurdan de ev berhem hatine nivîsandin. Nivîsandina ferhengan hem wek karekî zimannasiyê hem jî wek karekî edebî hatine dîtin. Lewra ferheng jî wek cureyên din yê edebî, cureyek edebiyata klasîk e û estefîka edebiyata klasîk jî di nava xwe de dihewînin.

Ferhengên menzûm di pergala medreseyan de ji bo zarokan hatine nivîsandin û di dersan de wek materyalan hatine emilandin. Bi vî awayî zarok hem hînê zimanê biyanî bûne hem jî qaîdeyên zimannasiyê fêr bûne. Gelek armancên nivîsandina ferhengên menzûm hene. Yek ji van armancan jî hêskirina ezberê ye. Ji ber ku ferheng bi awayekî helbestkî dihatin nivîsandin ezberkirina wan jî hêsan dibû. Ferhenga menzûm a bûyî mijara xebata me jî li ser heman armancan ji bo fêrkirina zimanê Erebî hatiye nivîsandin. Naveroka xebata me ji ferhenga menzûm a bi navê *Kitab-u Ehmediye*'ya Şêx Merûfê Nodeyî (1753-1837) pêk tê.

Piştî lêkolînên pêwist ên ji bo ferhengê hatin kirin, di beşa destpêkê de bi awayekî kurt li ser ziman û xebatên li ser zimên hatin kirin hate sekinandin. Pişt re di beşa yekem de agahiyên di derbareyê kevneşopiya ferhengên menzûm û ferhengên Kurdî de hatin dayîn. Di beşa duyem de agahiyên di derbarê muellif de û berawirdîkirina herdu nusxeyên ferhenga wî hate kirin. Di beşa sêyem de ferheng ji aliyê ruxsarî, naverokî û zimên ve hate lêkolîn kirin. Di beşa çarem de agahiyên di derbarê nusxeyê de û transkrîpsiyona ferhengê hate dayîn. Di encamê de tesbîtên piştî lêkolînê yên di derbareyê ferhengê de hatin nivîsandin.

Peyvên Sereke: Kitab-u Ehmediyye, Ferheng, Ferhengên Menzûm, Lêkolîn

ÖZET

Zeydin GÜLLÜ

KİTAB-U EHMEDİYYE'NİN TRANSKİRİPSİYON VE İNCELEMESİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Danışman: MEHMET ZEYDİN YILDIZ

2019, Van. IX + 162 s.

Manzum sözlükler doğu edebiyatında eski, geniş ve yaygın bir geleneğe sahiptirler. Arap, Fars, Türk, Peştü, Beluci ve Kürd toplumlarında bu eserler yazılmışlardır. Sözlük yazımı hem dilsel hem de edebi bir uğraş olarak görülüyordu. Zira sözlükler de diğer edebi türler gibi klâsik edebiyatın bir türü olup içerisinde klâsik edebiyatın estetiğini barındırırlar.

Manzum sözlükler medrese sistemlerinde çocuklar için yazılmış olup derslerde materyal olarak kullanılmışlar. Bu şekilde çocuklar hem yabancı dil öğrenmişler hem de dilbilim kaidelerini öğrenmişler. Manzum sözlüklerin birçok yazılma amaçları vardır. Bunlardan biri de ezberi kolaylaştırmadır. Zira sözlükler şiirsel bir dille yazıldıkları için ezberlenmeleri kolay oluyordu. Çalışmamızın konusunu oluşturan sözlük de aynı amaçlar üzerine, çocuklara Arap dilini öğretmek için yazılmıştır. Çalışmamızın içeriği Şêx Merûfê Nodêyî'ye (1753-1837) ait manzum sözlük *Kitab-u Ehmediye*'den oluşuyor.

Sözlük için gerekli araştırmalar yapıldıktan sonra, giriş bölümünde öz bir şekilde dil ve dil üzerine yapılan çalışmalar üzerinde durulmuş. Ardından birinci bölümde manzum sözlük geleneği ve Kürdçe sözlükler hakkında bilgi verildi. İkinci bölümde yazar ile ilintili bilgiler verildi ve sözlüğüne ait iki nüshanın karşılaştırılması yapıldı. Üçüncü bölümde sözlük şekilsel, muhteva ve dilsel açıdan incelendi. Dördüncü bölümde nüsha hakkındaki bilgiler verilir ve sözlüğün transkripsiyonu verildi. Sonuçta, araştırma sonrası sözlük hakkında elde edilen tespitler yazıldı.

Anahtar Sözcükler: Kitab-u Ehmediye, Sözlük, Manzum Sözlükler, İnceleme

ABSTRACT

Zeydin GÜLLÜ

THE REVIEW AND TRANSCRIPTION OF KİTAB-U EHMEDİYYE

MASTER'S THESIS

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

DEPARTMENT OF KURDISH LANGUAGE AND CULTURE

Supervisor: MEHMET ZEYDİN YILDIZ

2019, Van. IX + 162 p.

The verse dictionaries have an old, broad and widespread tradition in eastern literature. These works were written in the Arab, Persian, Turkish, Pashtun, Balochi and Kurdish communities. Writing a dictionary was seen as a linguistic and literary activity. Dictionaries, like other literary genres, are a kind of classical literature and they contain the aesthetics of classical literature.

They were written for children in madrasa systems and were used as materials in the education. In this way, children both learned foreign languages and learned the rules of linguistics. The dictionaries written in verse have many purposes. One of these is to facilitate the memorization. Because dictionaries were written in a poetic language, they facilitated memorizing. The dictionary, which is the subject of our study, was written on the same objectives, as well as to teach children the Arabic language. The content of our study consists of verse dictionary Kitab-u Ehmediyye.

After the necessary research was done for the dictionary, language and the studies on language were emphasized in the introduction. Then, in the first chapter, information about verse dictionary tradition and Kurdish dictionaries were given. In the second part, information about the author was given and two copies of the dictionary were compared. In the third chapter, the dictionary was examined in terms of form, content and linguistic aspects. In the fourth chapter, the transcript of the dictionary was given. As a result, the findings on the dictionary obtained after the research were written.

Keywords: Kitab-u Ehmediyye, The dictionary, Verse Dictionaries, Review

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
NAVEROK	IV
PÊŞGOTIN.....	VII
KURTEBÊJE	IX
DESTPÊK.....	1
1. Armanc û Girîngiya Tezê.....	3
2. Rêbaz	3
BEŞA YEKEM: FERHENGÊN MENZÛM (ÇARÇOVEYA TEORÎK)	5
1.1. Ferhengên Menzûm	5
1.1.1. Sedemên Nivîsandina Ferhengên Menzûm	6
1.1.1.1. Materyalên ji bo Dersan û Hêskirina Ezberê	6
1.1.1.2. Destpêka Qur'an'ê.....	7
1.1.1.3. Hînkirina Kêşa Erûzê	7
1.1.1.4. Nîşandan Zanîn û Hunerê	8
1.1.2. Taybetiyên Ferhengên Menzûm	8
1.1.2.1. Muqeddîme / Dîbace.....	9
1.1.2.2. Beşa Bingehîn	9
1.1.2.3. Xetîme	9
1.1.3. Kurtedîroka Kevneşopiya Ferhengên Menzûm di Rojhilata Navîn de.....	9
1.1.4. Kurtedîroka Ferhengên Menzûm di Zimanê Kurdî de	11
1.1.4.1. Nûbihara Biçûkan	11
1.1.4.2. Mîrsadu'l-Etfal / Şahrahê Kûdekan	12
1.1.4.3. Gulzar	13
1.1.4.4. Du Rişte	13
1.1.4.5. Ferhenga Quranê.....	14
1.1.4.6. Nûbihara Mizgefta Sîriyê.....	14
1.1.4.7. Nûbihara Mezinan	14
1.1.3.8. Luxetnameyî Ehmedî	15
BEŞA DUYEM: ŞÊX MERÛFÊ NODEYÎ Û AGAHİYÊN DI DERBARÊ WÎ DE.....	16
2.1. Jiyana Şêx Merûfê Nodeyî.....	16

2.1.1. Perwerdeya Şêx Merûfê Nodeyî û Rola Wî ya li Herême di Jiyana Siyasî, Civakî û Olî de	17
2.2. Berhemên Şêx Merûfê Nodeyî	19
52. 2.2.1. Kitab-u Ehmediye	22
BEŞA SÊYEM: JI ALİYÊ RUXSARÎ, NAVEROK Û ZIMÊN VE VEKOLÎNA KÎTAB-U AHMEDÎYE'YÊ.....	23
3.1. Ji Aliyê Ruxsarî ve	23
3.1.1. Teşeyên Nezmê	23
3.1.1.1. Awayê Mesnewiyê	23
3.1.1.2. Awayê Xezelê	24
3.1.2. Serwa û Paşserwa.....	24
3.1.2.1. Serwa.....	24
3.1.2.2. Paşserwa.....	26
3.1.2.3. Serwayên bi Cînasê	27
3.1.2.4. Hejmara Beş, Malik û Peyvan.....	28
3.2. Lêkolîna ji Aliyê Naverokê ve.....	28
3.2.1. Pergala Pedagojîk	28
3.2.1.1. Tezad	28
3.2.1.2. Têkiliya Parçe û Komê	29
3.2.1.3. Têkiliya Gelemperî û Taybetê.....	29
3.2.1.4. Rêbaza Pirskirinê	30
3.2.2. Mijarên Serbixwe	30
3.2.2.1. Reng.....	31
3.2.2.2. Dîn	31
3.2.2.3. Mekân.....	31
3.2.2.4. Bergeh û Alî	32
3.2.2.5. Pîşe	32
3.2.2.6. Endamên Laşê Mirovan.....	33
3.2.2.7. Kozmolojî.....	33
3.2.2.8. Fîzyonomî	33
3.2.2.9. Endamên Malbatê	33
3.2.2.10. Dem û Wext.....	34
3.2.2.11. Rewşên Hewayê	34
3.2.2.12. Mucewher û Xeml	34

3.2.2.13. Aletên Kevn	35
3.2.2.14. Cil û Berg	35
3.2.2.15. Xwarin û Vexwarin	35
3.2.2.16. Hejmar	36
3.2.2.17. Nebat	37
3.2.2.18. Ajal	37
3.3. Ji Aliyê Zimên ve	38
3.3.1. Navdêr	38
3.3.1.1. Navdêrên Hevwate	38
3.3.1.2. Navdêrên Dijwate	39
3.3.1.3. Navdêrên Nêzdeng û Nêzwate	39
3.3.2. Hevalnav	40
3.3.3. Zayend	40
3.3.4. Pirjimarî û Yekjimarî	41
3.3.5. Hevok	41
3.3.6. Qertaf	42
3.3.7. Lêker	42
3.4. Cudahiyên di Navbera Luxetnamey Ehmedî û Kitab-u Ehmediyye'ê de	43
3.4.1. Destpêk	43
3.4.2. Sebebê Telîf	44
3.4.3. Serenav, Beş û Malik	44
3.4.4. Ziman û Guherîn	46
3.4.5. Behr, Wezn û Qafiye	48
3.5. Tehlîl	50
BEŞA ÇAREM: TRANSKRÎPSİYONA NUSXEYA KITAB-U EHMEDIYYE'YÊ	53
4.1. Çend Nîşe li Ser Nusxeyê	53
4.2. KÎTAB-U AHMEDİYE (TRANSKRÎPSİYON)	57
ENCAM	103
ÇAVKANÎ	106
PÊVEK: ORJÎNALA NUSXEYÊ	113

PÊŞGOTIN

Ferhengên menzûm berhemên xebatên li ser gramrê ne. Beriya wan jî xebatên cuda ji hêla zimannasan ve hatine kirin. Lê ferheng ji gelek hêlan ve ji wan berheman cuda dibin. Sedemên cuda yê nivîsandina van berheman hene. Ferheng xwedî hin rêbazên aîdê cureya xwe ne. Ev ferheng jî wekî cureyên din cureyek ji edebiyata klasîk in.

Ferhengên menzûm ji bo zarokan, ji aliyê alimên perwerdeya medreseyan dîtine ve bi mebesta materyalên dersan hatine nivîsandin. Lewra di pergala medreseyan de ji bo pêşketinê hêmanek bingehîn jî, zanîna ziman û pergala xebatan bû. Di vê mijarê de ferheng diketin holê û pêdiviya zarokan pêk tanîn.

Kevneşopiya ferhengên menzûm di rojhilatê de kevn û berbelav e. Ji aliyê civakên cuda ev xebat hatine kirin. Herçendî di destpêkê de ji bo fêmkirina metnên dînî li ser zimanekî derketibin holê jî pişt ra hin guherîn dikevin nava wan. Di nav Faris, Tirk, Peştû, Hindî, Belûcî û civakên din de ferhengên menzûm hatine nivîsîn. Gava em bala xwe didin ferhengên menzûm em dibînin ku gelemperî ji bo fêmkirina ziman û edebiyatên serdest û rewacê hatine nivîsîn.

Di nav Kurdan de xebatên ferhengên menzûm li gorî civakên din hinekî dereng hatine kirin. Lê di edebiyat û zimanê Kurdî de piştî berhema yeke hema hema di her sedsalê de ferhengek menzûm hatiye nivîsandin. Ya yekem ji aliyê Ehmedê Xanî (1651-1707 ve di sala 1687an de hatiye nivîsîn û ev xebat heta dema me hatine domandin di dîrokên cuda de. Yek ji van xebatan jî nusxeyek ferhenga Şêx Merûf Nodeyî (1753-1837) ya bi navê *Luxetnamey Ehmedî ye* ku navê nusxeyê *Kitab-u Ehmediye ye*. Me jî xwast xebatek vekolîn û analîzê li ser vê nusxeyê bikin. Lewra di navbera herdu nusxeyan de cudahî hene. Herdu nusxe hem ji aliyebêjeyan ve hem jî ji aliye malikan ve ji hev cûda ne.

Xebata me ji destpêkek, çar beşên analîza ferhengan û nusxeya me û muellifê wê û encamekê pêk tê. Di destpêkê de em bi awayekî taybetî li ser zimên û xebatên li ser zimên sekinîn. Lewra ji bo fêmkirina nivîsandina ferhengan û xebatên bi vî awayî agahiyên di derbareyê zimên de girîng in.

Di beşa yekem de me di derbarê ferhengên menzûm ên civakên rojhilata navîn agahî dan û yê Kurdî me bi awayekî berfireh dan nasîn. Di beşa duyem de em li ser muellifê nusxeyê sekinîn û me di derbarê wî de agahî dan. Di beşa sêyem de me analîza herdu nusxeyên ferhengê kir û tespîten xwe nivîsandin. Di beşa çarem de me di derbarê nusxeyê de çend nîşe dan, rêbaza sazkirina metnê îzah kir û transkrîpsiyona berhemê da.

Di amadekirina û lêkolîna vê xebatê de me ji çend kesan agahiyên baş standin. Di rewşê me zehmet dîtî de ji her aliyê ve alîkariya min kirin. Di xwendin û fêmkirina qismên bi zimanê Erebi de birêz Mela Adil Zana hertim alîkariya me kir û rê nîşanî me da. Ji aliyê akademîk ve di amadekirina bingeha xebatê de birêz mamoste Semih Gezer alîkariya xwe di tu rewşan de ji me qut nekir. Şêwirmendê teza me birêz Prof. Dr. M. Zeydin Yıldız jî, di her mijar, pirsgerêk û rewşê de bi ramanên xwe yê girîng şêwirmendiya me kir. Ji bo van alîkariyan ji cenabê hersêyan re spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Zeydin GÜLLÜ

Wan-2018



KURTEBÊJE

wer: werger

hej: hejmar

hwd: herwekî din

amd: amadekar

c: cild

r: rûpel

bnr: binêrin

mr: mirin

yd: yêd din

Î.K: Întîşarata Kurdistan

K.E: Kitab-u Ehmediye

-: nîne

DESTPÊK

Ziman, di serê nîrxên çandî ên gelan de têne hesibandin û ziman mîrasek e ku gelan ji rabirdûyê hilgirtiye (Sancak, Durukan û Alver, 2008: 1001). Ziman pergalek sembolan e, mirov bi rêya vê pergalê hest, raman, daxwazîyên xwe derdixin holê û bi hev re bi vê pergalê ragihandinan pêk tînin. Ji bo lihevkerin û ji hev fêmkirina kesên di civakekê de bêguman ziman pêdiviyek e. Terzê jîyanê, çand, kevneşopî, nêrîna cîhanê, têkiliyên digel gelên din û merhaleyên gelan ên di nava dîrokê de bi rêya zimên tînin fêmkirin. Terzên fêmkirin û vegotina gerdûnê ya gelan ziman e. Gava ziman tê vekolandin ev terz derdikeve holê. Mecaz, şibandin, gotinên pêşîyan û biwêj dema têne vekolantaybetmendiyên civakê digel van hêmanan derdikevin holê.

Wekî ku tê zanîn di dîroka mirovahiyê de tevgerek mirovan ya li ser rûyê erdê pêşêxistina ziman e. Di nav qonaxên dîrokî de mirovan ji bo parastin û pêşêxistina zimanê xwe serî li xebatên li ser zimên dane. Ji bo destpêka xebatên li ser zimên Aksan vê yeke tîne ziman:

Xebatên kevin yên li ser zimên jî ji aliyê şaristaniyên kevin yên wekî Hind û Yewnaniyan ve hatine kirin. Du faktor li ser arastebûna bikaranîna zimên û mijarên wî rol leystine. Ya jî van ya ewil ol e. Em dikarin bêjin ku îhtimama li ser dua û metnên olî di kirina xebatên li ser zimên de bandor kirine. Wekî tê zanîn xelet xwendin û xelet nîrxandina duayekî, di tu olî de baş nayê dîtin. Ji bo veguhestina pirtûkên pîroz û metnên olî hewl hatiye dayîn, digel danîna hin rêzikên nivîs û xwendinê têgehên zimannasîyê diyar bûne û pêdivî çêbûye ku li ser van bisekin. (Aksan, 1995: 16)

Xebatek din ji van xebatan, ya girîng jî sazkirina ferhengan e. Lê sedemên sazkirina ferhengan digel van hêmanan, bi hêmanên wekî pêşketina civakan, ramiyarî, erdnîgarî, kevneşopî, bazirganî û hwd. ve jî girêdayîne (Yavuzrarslan, 2004: 187; Korkmaz, 2002: 2). Ji bilî van sedemên wekî çand, aborî, civakî û bazirganiyê ji şaristaniyên kevin ve nivîsîna bedew ji bo mirovan wekî mijarek estetîkê hatiye qebûl kirin û di vê kontekstê de mirov li ser ziman û rêgezên zimên sekinîne. Lewra “ji bo hebûn berdewamiya zimanekî, tiştên herî girîng ferheng in. Ew dewlemendiya raman û çanda gelan in. (Ertekin, 2017: 89)”.

Di nav qonaxên dîrokî de şaristanî digel şaristaniyên din ketine nava têkiliyên cuda. Vê yekê jî, li ser ziman û jiyana mirovan bandorên mezin pêk anîne. Peyvên nû ketine zimanan, peyv ji zimanan hatine jîbîrkin, hatine guhertin, bi vî awayî ziman formên nû

standine. Bi pêşketina civak, ziman û zêdebûna nifşan, pêdiviya ferhengan hê bêhtir bûye û ferheng hatine çêkirin. Di derbarê vê de Cemal Muhtar weha dibêje:

Her ziman, bi wextî re ewqasî tê guhertin û pêş dikeve ku neviyên mensûbên heman neslî an jî bavikên heman neslî tîrî rewşeke wisa ku, gelek peyvên bav û kalên wan bikaranîne fêrî nakin. Ji bo fêmkirina wan, serî li ferhengan didin. Gelek çarî di nav bavikên heman neslî de cudatiya peyv û şeweyan tê dîtin. Eger bi zimanekî din lêkolîn hewce bike wî çaxî pêdiviya bi ferhengê qat bi qat zêdetir dibe. (1983: 363)

Dîroka ferhengan bi awayekî teqez û fermî nayê zanîn ku ferhenga yekem ji aliyê kî ve û di çî wextî de hatiye çêkirin. Li ser vê mijarê gelek nêrînên cuda hene. Lê eger em dîroka ferhengan li gorî terzê devokî bidin destpêkirin em dikarin ayeta Qur'an'ê ya ji sûreya Beqere'ê ya sihemîn "ez ê li ser rûyê erdê xelîfeyekî biafirînim" wekî ferhenga yekem bihesbînin (Altuntaş û Şahin, 2013: 7). Dîsa di heman peywendê de ayeta di Incîl'ê de "wê çaxê divê çawa be birayên min! Divê di civînên me yê ruhanî de tevînek, doktrînek, îlahiyek, daxuyaniyek xwedawendî, zimanekî biyanî, wergerek herkesî hebe. Divê ev hemî di peywenda avakirinê de bin. Eger kesekî bi zimanekî biyanî bipeyive, bila du an jî herî zêde sê kes bi dor biaxivin, yek jî wergerê bike" (Incil, 1994: 26-27), em dikarin destpêka ferhengên bi duzimanî bihesbînin.

Destpêka tradisyona ferhengên nivîskî, mijarek tevlihev û ne teqez e. Li ser ferhenga yekem hatî çêkirin gelek nêrînên cuda hene. Li gorî hin çavkaniyan ya yekem ji aliyê Bawetshî'yê Çînî ve hatiye çêkirin û ferheng di nava xwe de çil hezar peyvên dihewîne (Yavuz, 2002: 114). Li gorî Engin Yılmaz, ferhenga ewil *Urna Hubullu* ya ji aliyê Sumerî-Akadmî ye (2017: 3) û li gorî Sami Baskın dibe ku di navbera zimanên Babîlî-Akadmî û Sumerî de be (2014: 446).

Ferhenga li gorî stardartên roja me jî, ji aliyê rêveberê Muzeya Îskenderiye'yê Aristophanes'ê Bîzansî ve hatiye çêkirin û peyva ferhengê jî wek têgehê cara yekem ji aliyê John Garland ve hatiye bikaranîn (Aksan, 393-4). Wateya vê têgehê jî li gorî Vardar:

Berhema ku hemû an jî qismek yekeyên peyvî yê di zimanekî de, gelemperî bi alfabetîk, di hin rewşan de jî li gorî mijar an jî têgeh, pênaseyan, şahidan, vegotinan, eslan, bikaranînan, komên zimannasiyê, hemwateyan hwd. an jî wateya wan ya di zimanekî din de pêşkêş dike (1998:191).

Kevneşopiya nivîsandina ferhengan di serî de ji bo pêdiviya sedemên cuda cuda derketibe holê jî digel buhûrîna wêxt ji aliyê kesên zimannas ve wek xebatên ferdî hatine kom kirin û veguhêzîne terzê rîsaleyan.¹

1. Armanç û Girîngiya Tezê

Di edebiyatê de, ji bo isbatkirina edebiyatekê, hebûna materyalên kevn e xwedan girîngî ne. Materyalên kevn yê edebiyatekê hebûna wê edebiyatê bi belgeyan isbat dikin û rê li ber xebatên din vedikin an jî rêya ku vekirî geştir dikin. Bi van materyalan edebiyat hem bingeha xwe xurt dike, hem jî ji bo afirandina berhemên din dibe mînak.

Di nivîsandina ferhengan de, muellif, hem wek zimannasekî hem jî wek rewşenbîrekî ferhenga xwe amade dike. Ji bo xebatên hîndekariyê ferhengan cihekî girîng girtine. Lewra di serdema medreseyan de, zimanê zikmakî ji bo ilmê medreseye têra hînbûna ilmekî nedikir. Girîngiya ferhengsaziya Kurdî jî di vê derê de derdike holê. Bi vî awayî digel zimanê Erebi hişmendiyek Kurdewarî jî di nav gel de çêbûye. Ji ber vê ye ku şairên piştî Ehmedê Xanî ên wekî Ismaîlê Bazîdî (1655-1710) û Şêx Mihemedê Kerbelayî (1885-1939) mane di bin bandora wî de û ferheng nivîsandine. Lê mixabin dîsa jî ev xebatên li ser ferhengan di edebiyata Kurdî de zêde nehatine kirin an jî haya me ji wan tune ye. Yê hatîn dîtîn jî, ji çendekan derbas nabin û ev jî hem ji bo edebiyata Kurdî, hem ji bo zimanê Kurdî dibe kêmasiyek. Ji ber ku bi van xebatan ziman di cihê xwe de namîne, pêş dikeve û edebiyat jî bi nivîsandina van ferhengan ya bi teşeyê mesnewînivîsînê dewlemendtir dibe.

Bi vê mebestê em ê di vê xebata xwe de li ser berhemek menzûm bisekinin û em ê berhemê di konteksta berhemên din ên wekî wê de binirxînin. Bi vê yekê em ê transkrîpsiyon û analîza berhemê bikin, li ser berhemê hin agahî bidin.

2. Rêbaz

Rêbaza xebata me li gorî rêbaza xebatên li ser ferhengan hatîn kirin û li gorî pîvanên edebiyata klasîk hate kirin. Di serî de me di derbarê girîngiya zimên de hin agahî dan, li ser ferhengên menzûm û kevneşopiya wan sekinîn û pişt re me du nuskeyên ferhengê berawird kirin. Piştî van xalan em derbasî mijara eslî bûn. Me berhem ji aliyê wê yê edebî û zimanî ve analîz kir û ev aliyên wê derxistin holê.

Rêbaz û qonaxên vê xebatê wiha ne:

¹ Ji bo bêhtirîn agahî di derbarê cureyên ferhengan de bnr: Yavuz, 17-8, Gülbil, 2010: 3, Ölker, 2011: 47.

1) Me di serê xebatê de metn bi rêya kopîyê dest xist û dest bi xebata xwendina wê kir. Metn ji aliyê du kesan ve hate xwendin ku xeletî nekevin nava metnê.

2) Piştî transkrîpsiyona metne, me nusxeya din ya ferhengê peyda kir û di navbera herduyan de xebatek berawirdî çêkir. Bi vî awayî me taybetiyên herdu metnan derxistin holê.

3) Di mijarên ku me li ser lêkolîn kirin de, bêjeyên ku di malikên de wek mînak hatin bikaranîn, me bi boldê ango reşa tarî nîşan dan.

4) Malikên ji derveyî metnê hatin nivîsîn, di nav metnê de li cihê pêwist bû ku lê bin hatine nivîsandin.

5) Di derbarê metna Farisî ya di dawiya ferhengê de me agahî dan û me metna Farisî wergerand Kurdî.

6) Piştî lêkolînek berfireh ya li ser ferheng û agahiyên di derbareyê ferhengê de, me analîzên li gorî pîvanên edebiyata klasîk kirin û ev analîz di nav xebatê de nixandin.

7) Nusxe ji beşek bênav û ji du beşên binavkirî pêk dihat. Me ji bo beşa bênav "1" kir nîşane, ji herdu beşên binavkirî jî, me jimareyên "2 û 3"yê bikaranîn. Jimareya pêşiya xêzwarê, beşê nîşan dîke û jimareya piştî xêzwarê hejmara malikê ya di nav beşê de nîşan dide.

8) Piştî qedandina nusxeya bi navê Kitab-u Ehmediye'yê me edisyon-krîtîk digel nusxeya Întişara Kurdistanî danî. Herdu nusxe ji aliye tîp, bêje û malikan ve hatin muqayese kirin û cudahî bi jêrenotan hatin dayîn. Peyvên ku tîpên wê hatine guhertin wek jêrenot hatin nivîsandin û heman peyvên di nusxeya din de ligel jêrenotên wan hatin nivîsandin. Tîp, bêje û malikên di nusxeyekê derbas nabin bi sembola "-“ hatin nîşanekirin.

8) Di dawiyê de me analîzên di derbarê xebatê nivîsandin.

BEŞA YEKEM: FERHENGÊN MENZÛM (ÇARÇOVEYA TEORÎK)

1.1. Ferhengên Menzûm

Di nav civakên şaristaniya Îslamî de Ereb û Farisan, Kurdan rolek mezin hilgirtiye. Civakên rojhilata navîn bi gelemperî xwediyê şaristanî û daneheveke çandî ya hevpar bûn. Di neqilkirina vê şaristanî û daneheva çandî de jî rol û bandora edebiyatê hertim rol girtiye. Zanyarên demê gelek caran bi rêya edebiyatê û cureyên nivîsandinê fikrên xwe ji bo nişên nû neqil kirine. Ev edebiyat jî wekî edebiyata klasîk hatiye binavkirin.

Di warê edebiyata klasîk de cureyek herî kêrhatî jî zimanê helbestkî ye, ango menzûme ne. Lewra zimanê helbestkî xwediyê hin taybetmendiyan xweserê xwe ye. Ev taybetmendiyan wekî serwa û kêşeyê tîna binavkirin wê derfetê didin muellif ku bikare hêsantir fikir û zanînan xwe bixe qada edebiyatê. Di vê berekê de di bikaranîna şaxezanistên wek tib, astronomî, geşt û ger, pendname, zimannasî, gramer, erdnîgarî û hwd. de teşeyên menzûn hatine tercîhkirin. Ji bo neqilkirin û parastina zanistan, hewcedarî bi nivîsandinê hebû û di vî warê de derfeta herî baş menzûme didin. Atabey Kılıç di derbarê zanist û neqlê de vê yeke tîna ziman:

“Ji ber ku zanistên Îslamî bi gelemperî spartiyê neqlê bûn, bêyî xirabûn, parastin û neqilkirina ji bo nişên nû gelek girîng bû. Tabî rêyek qewî ya vê jî piştî nivîsandina berhemê ezberkirina wê ya ji aliyê alimên ve bû. Rêya herî hêsan ya ezberkirina pirtûkekê jî menzûmkirina agahiyên wê bû” (Kılıç, 2006a: 85).

Gava em bi vî awayî li edebiyata klasîk binêrin em dibînin ku edebiyata klasîk xwedî rewac bûye. Di nav metnên edebî de cureyek zêde xwedî rewac jî ilmê luxatê ango ilmê ferhengsaziyê bûye. Gava em bi çavê roja me li ferhengsaziyê binêrin “ji aliyê nivîsandinê ve ferheng di du kategoriyan de tîna nixandî. Ya yekem, ferhengên di peywendê kêş û pîvanê de bi awayê helbestkî hatîna nivîsîn, ya din jî yên di roja me de bi terzê pexşanê tîna nivîsîn. (Ertekin, 2017: 91)”. Ji van ferhengên bi terzek helbestkî hatîna nivîsîn re ferhengên menzûm tê gotin. Di edebiyata rojhilata navîn de ev cure ji aliyê gelek civakan ve hatiye bikaranîn. Sedema wê ew e ku ji bo bikaranînê hem ilmê kûr û hûrgilî pêwîst e û ev yek muellifên ferhengên menzûm jêhatîtir dike hem jî zanîna zimanekî biyanî di dîrokê de hertim xwedî îtibar bûye. Lewra zimanek deriyekê ilmê li ber muellifî vedike. Derfeta ku vê yekê dide kesekî jî metnên ferhengên menzûm in. Lê divêt ev yek jî bê zanîna ku ferhengên menzûm di qada zanistî de ne çavkaniyên ciddî û tîrker in (Kılıç, 2006^a: 81).

Herçendî ev ferheng di nav zimanên rojhilata navîn de hatibin nivîsîn jî, pişt re di heman şeweyê de bi zimanên Ewropî re jî hatine nivîsîn (bnr: Erciyas, 2011: 72-6).

1.1.1. Sedemên Nivîsandina Ferhengên Menzûm

Ferhengên menzûm piştî geşedana ola Îslamê di nav coxrafyaya rojhilata navîn de hatine bikaranîn. Dema em li van ferhengên di bin bandora ola Îslamê û çanda Farisan de derketî dinêrin kêma zêde hemî li ser mijarên hevpar hatine nivîsîn û mebesta muellifan bi gelemperî heman tişt e. Lê pişt re ji derveyî armancên hevpar ferhengên menzûm hatine nivîsîn. Mebest di vî terzê nû de jî danasîna devoka şairî ye (bnr: Babacan, 2017: 87-110). Sedemên hevpar ên ferhengên menzûm, em dê di bin serenavan de li jêr daxuyan bikin ji ber ku wek hevokê îzahkirina van dê kêma bimîne.

1.1.1.1. Materyalên ji bo Dersan û Hêskirina Ezberê

Armançek girîng û sereke ya nivîsandina ferhengên menzûm ji bo zarokan hêskirina ezberê ye (Öz, 2016: 53; Kaya, 2017^a: 214; Kaya, 2017^b: 514; Doğan, 2016: 17). Zarokên ku nû dest bi xwendina perwerdeyê dikirin, di xwendin û nivîsandina peyvên biyanî de zehmetî dikişandin. Ji ber vê sebebê ev ferheng ji aliyê şair û mamosteyên medreseyan ve ji bo tehsîlê hatine nivîsîn. Lewra bi rêya van ferhengan zarokên medreseyan hînî peyvsazî, gramer û hevoksaziya zimanên biyanî dibûn. Ji bo hînbûna zimanekî biyanî ezberkirina peyvan, destpêka hînbûna ziman e. Ferhengên menzûm jî xwendekar digihjînin mebesta wî û ve yekê bi awayekî xwendekar jê hez bike didin kirin. Perihan Ölker di derbarê ferhengên menzûm de wiha dibêje:

[Wekî ku tê zanîn kevneşopiya bi kêş û serwa nivîsînê bingeha edebiyata me ya klasîk çêdike, ferhengên ku mebestek dîdakîk di xwe de dihewînin jî parçeyek girîng yê vê kevneşopiyê ne. Bi vî awayî rêbazek bandorker ya hînkirina zimên hatiye tercîhkirin, xwendinek bi zewq, bi hêsanî û bo demekdirêj peyv jiberkirin pêk hatiye. (2009: 874)

Zarokên ku ji van ferhengan ders didîtin digel zimanên biyanî hînî ilmê belaxat û fesahatê jî dibûn (Öz, 2016: 53). Wekî ku tê zanîn, ilmê belaxatê di nava xwe de zanistên cur bi cur dihewîne. Di vir de mebest ew e ku di paşerojê de xwendekarê ku ev ders xwendî bibe xwediyê zimanek herikbar û fesîh.

1.1.1.2. Destpêka Qur'an'ê

Di destpêka nivîsandina ferhengên menzûm de armanca sereke fêmkirina Qur'an û hedîsên Pêxember bû (Gümüş, 2007: 425; Yüçetürk, 2016: 291; Lutfî Efendi, 2012: 9).

Armanca fêmkirina metnên Qur'an'ê ne tenê ji bo civakên ne Erebi bû, herwiha Ereban bi xwe jî ji bo fêmkirina Qur'anê û hedîsên Pêxember ev xebat kirine. “Di nav Ereban de, bi pirsên sehabeyan yê di derbarê peyvên wateya wan neyê zanîn de û bersivdana pêxember ya digel van pirsan re hin xebatên bi ferhengan re têkildar destpê kirine. (Durmuş, 2009: 398)”.

Piştî xebatên Ereban, civakên din ên rojhilata navîn dest bi xebatên ferhengên menzûm kirine. Lê civakên din, ji Ereban cudatir rasterast ji bo hînkirina zimanê Erebi ferheng nivîsandine. Lewra zimanê Erebi wekî zimanê ola Îslamê ji bo fêmkirina Qur'an'ê û destxistina zanistan pêwîst bû. Di medreseyan de, zanist bi zimanê Erebi bû û ferhengên menzûm ên bi Erebi re têkildar wek materyalên dersê ji aliyê xwendekaran ve hatine bikaranîn.

Di nav merhaleyên dîrokî de sazkirina ferhengên menzûm ji armanca ewil hinekî dûr ketiye û li ser mijarên din, ferhengên menzûm hatine nivîsîn. Bo numûne ji bo peyvên xerîb ên di *Mesnewiya* Mewlana de ferheng hatine nivîsîn (Gümüş, 2006: 6). Wekî ku tê dîtîn ferhengên ji bo fêmkirina metnên olî hatîn çêkirin pişt re ji derveyî vê erka xwe jî hatine bikaranîn (bnr: Zararsız, 2015: 16).

1.1.1.3. Hînkirina Kêşa Erûzê

Her wekî ev ferheng di medreseyan de wek materyalên dersan hatîn bikaranîn digel van xalan di qada hînkirina kêşa erûzê de jî xizmet kirine. Muellifên ferhengnivîs gelek caran di nav metna bingeşê de di derbarê kêşê de jî agahî dane. Lewra armancek ferhengnivîsan ji vê yekê ew e ku xwendevanên berhema xwe hîni kêşa erûzê, teqîf, behr û gramerê bikin (Gümüş, 2007: 426; Selçuk û Algül, 2015: 134; Güler, 2016: 167). Mebest ji vê armancê, kesê ku di paşerojê de bixwazin bibin şair û meyla wan lê hebe tecrubeyekê jê bigirin (Öz, 1999: 5). Di nav kêşa erûzê de hin usûl hene ku karê jiberkirinê hêsan dikin, bi vî awayî şair hem berhema xwe bêhtir dixê qada jiberkirinê, hem jî mebesta xwe ya hînkirina wezna erûzê pêk tîne (bnr: Civelek, 2000: 289). Gava em li edebiyata Kurdî ya klasîk dinihêrin em dibînin ku Ehmedê Xanî di berhema xwe ya bi navê *Nûbihara Biçûkan* de ev pergal bikar aniye.

1.1.1.4. Nîşandan Zanîn û Hunerê

Di nivîsandina ferhengên menzûm de sedemek girîng ya nivîsandina van ferhengan xwastina nîşandana zanîna zanist û hunera wêjeyî ye. Lewra di nivîsandina ferhengan de du xalên girîng hene. Yek ji wan zanîna ilm e. Lewra eger muellifê ferhengê ne xwediyê zanistek kûr û bi hûrgilî be, nikare ferhengeke menzûm binivîse; jixwe eger ferheng bi du zimanan be, barê muellif wê çaxê girantir dibe. Ji bo curetkariya nivîsana ferhengê divê muellif di nav çandek ilmî de xwe pêş êxistibe. Rêya vê curetkariyê jî di zanistên medreseyê re derbas dibe. Ji ber ku edîbên demê bi gelemperî di bin perwerdeya medreseyan re derbas bûne.

Xala din ya girîng jî jêhatîbûna di edebiyata klasîk de ye. Muellif eger di kêş, serwa, paşserwa, teqtî, behr û hunerên edebî de ne jêhatî be, herçiqas di ilm de zana be jî nikare berhema di qada edebî de derxe pêş. Ji ber hindê divê şair di qada edebiyatê de jî xwedî huner be û ehlê hunerê di metna wî de qusûran piştguh bikin. Ev malika Şahidî mîna keke bo vê yeke:

Dârem ümmîd ki in turfe-kelâm

Ki çü 'ıkd-ı güher âmed benizâm

Bünümâyed bemededkâri°ayb

Piş-i erbâb-ı hüner dür ez 'ayb². (Zararsız, 2015: 69)

Gava şair armanca xwe tenê li ser zanîna ilmî ava bike, wê çaxê wekî Wellek-Austin gotî, hukmê kargerê bingehîn namîne û emilandina duyem derdikeve pêş (Wellek-Austin, 2001: 15). Lê muellif wê yekê jî dike armanc, lewra ferhengên menzûm di medresyan de wek materyalên dersan dihatin bikaranîn û ev yek dibû wesîleya navdarbûna muellif. Di navdarbûna şairê Kurd Ehmedê Xanî de bêguman digel berhemên din hêza ferhenga wî ya menzûm *Nûbihara Biçûkan* nayête jibîrkirin (Xeznedar, 2001: 68-9).

1.1.2. Taybetiyên Ferhengên Menzûm

Di nivîsandina ferhengên menzûm de rêbazeke klasîkbûyî hatiye bikaranîn. Ji ber hindê, gava em li ferhengên menzûm dinêrin di navbera wan de cudahiyek zêde berbiçav nayête dîtin. Di edebiyata klasîk de terzê nivîsandina menzûmêyan bi rêya cureya mesnewiyê dihate pêk anîn. Lewra ji aliyê qafiyeya xwe ve mesnewiyên ew derfet dida

² Mîna hêvî heye ku ev gotinên min ên turfeyê wek gerdembendek bidur bikevin nîzamê.. gotina min meded û xeybê bîne ber çavan û li cem ehlê hunerê ji eyban berî be (wer: Zeydin GÜLLÜ).

nivîsakaran ku bikarin bi awayekî hêsan metna xwe bihûnin. Bi gelemperî, nivîsandina ferhengên menzûm li gor van sernavên li jêr hatine çêkirin.

1.1.2.1. Muqeddîme / Dîbace

Di nava vê beşê de bi gelemperî hemdele û selwele heye (Ertekin, 2017: 94). Ferhengnivîs di vê beşê de hemd û senayan ji Xwedê re dike, selam û selatan ji pêxember re dike û sebebê telîfa ferhengê di vê beşê de daxuyan dike. Di vê beşê de dengê ferhengnivîs bixwe heye lewra di sebebê telîfê de di derbarê xwe û sedema nivîsandinê de agahiyan dide. Bi vê rêyê muellif di derbarê girîngiya zimên, ilm û sûdên wan de fikrên xwe tîne ziman.

1.1.2.2. Beşa Bingehîn

Ev beş ji beşa eslî pêk tê. Di vir de beşên ferhengê hene û muellif vê beşê bi terzê qit'eyan dinivîse. Di derbarê qit'eya hatî bikaranîn de agahiyan dide ku kîjan qalibê kêşa erûzê bikarînaye (Kılıç, 2006^b: 67). Bi gelemperî navên qit'eyan bi terkîb an bi hevokerê Erebi an Farisî tê dayîn.

1.1.2.3. Xetîme

Beşa xetîmeyê beşa dawiyê ye, muellif di vir de duayan dike û temenniyên xwe yê di derbarê ferhengê de tîne ziman. Bi awayekî gelemperî şair di vê beşê de bi hesabê ebcedê dîroka nivîsandina berhema xwe dinivîsîn (Civelek, 2000:289; Gümüş, 2007: 425).

1.1.3. Kurtedîroka Kevneşopiya Ferhengên Menzûm di Rojhilata Navîn de

Di nav civakên Îslamî de bêguman ji aliyê civak, ziman, rêveberî, edebiyat, perwerde û hwd. de bandora civakan li ser hev çêbûye. Di nav van de bandora herî berbiçav û xuya li ser edebiyat û zimanan çêbûye. Li ser edebiyat û zimanan danûstandinên civakên rojhilata navîn çêbûne. Ji aliyê zanistî ve bandora herî mezin em dikarin bibêjin Ereban li ser derdora xwe kiriye. Lewra zimanê ola Îslamê zimanê wan yê zikmakî bû û vê yekê ji aliyê zimên ve pêşwendî kiribû.

Di vê coğrafyayê de xebatên li ser gramer û ferhengan cara ewil ji aliyê zimannasên Ereban ve hatine kirin. Ferhenga ewil di nav Ereban de ji aliyê Ismaîl. B. Îbrahîm b. Muhammed er-Ribî ve (mr: 1087) bi navê *Qeydu'l- Ewabid* bi terzê qesîdeyan hatiye nivîsîn (Kaplan, 2017: 215). Ev ferheng bi yek zimanî hatiye nivîsîn. *El Qamûs ull-Muhît*

a Fîrûzabadî û *Tac-ul-Luxat* û *Sîhah-ul-Erebiye*'ya Cewherî jî hêjayê behsê ne (Bingöl, 2006: 201). Bi demê re ferhengên bi du zimanan zêdetir hatine nivîsîn. Li ser ferhenga duzimanî ya ewil hin fikrên cuda hene. Li gorî Kılıç, ferhenga menzûma duzimanî ya ewil ji aliyê Bedruddîn Ebû Nasr Mes'ûd b. Ebî Bekr el-Ferahî ve bi navê *Niâbu's-Sıbyan* bi zimanê Erebi-Farisî hatiye nivîsîn (2006b: 67). Li gorî Ertekin jî, ji aliyê Reşîduddîn Watwat ve bi navê *Nukudü'z-zevâhir û ukudü'l-cevâhir* bi zimanê Erebi-Farisî hatiye nivîsîn (2017: 92). Li gorî İnce, di dîrokê de ferhenga menzûm ya tê zanîn ya Reşîduddîn Watwat e (İnce, 2002:177).

Di nav Farisan de xebatên ferhengan, ya ewil bi xebata Ebû Îsa b. Elî b. Îsa b. Dawid destpê dike. Pişt re Qetranê Tebrîzî, Surûrê Kaşanî û Încûyê Şîrazî ev xebat domandine (Kaygın, 2013: 2). Li gorî Kaplan ferhenga ewil ya ya du zimanî bi zimanê Erebi- Farisî ji aliyê El-Ferahî ve bi navê Nisab-u Sibyanê hatiye nivîsandin (Kaplan, 2017: 215). Bi heman awayî Dustûru'l-Luga'ya Edîb Natannazî jî ji bo Farisan fêrî Erebi bike bi zimanê Erebi û Farisî hatiye nivîsandin (Ölker, 2009: 874). Herçendî destpêka xebatên ferhengnivîsînê ve cara ewil ji aliyê Ereban hatibe kirin jî Farisan di vê mijarê de bêhtir xebat kirine.

Di edebiyata Tirkan de ferhenga ewil ji aliyê Mehmûdê Qaşgarî ve bi zimanê Erebi-Tirkî hatiye nivîsîn. Piştî berhema Mehmûdê Qaşgarî xebatên ferhengسازیê di nav edebiyatên Qipçaq, Çaxatay û Osmanî de destpê kirine (İnce, 2002:176). Muellif xwastiye nîşanî Ereban bide ku zimanê Tirkî jî bi qasî zimanê wan zimanek pêşketî û dewlemend e. Herwiha, xwastiye bi vê berhemê Ereban fêrî zimanê Tirkî bike. Ferhenga menzûm ya di nav edebiyata Tirkan de cara ewil ji aliyê Husam b. Hasan ve bi navê *Tuhfe-i Husam* bi zimanên Tirkî-Farisî hatiye nivîsîn (Kılıç, 2006b: 67), lê li gorî Yurtseven ev ferheng Erebi jî di nava xwe de dihewîne (2003: 28). Ferhenga bi zimanê Erebi-Tirkî hatî nivîsandin jî, ji aliyê Abdulletîf Ibn Melek ve bi navê *Lugat-i Feriştetoğlu* hatiye nivîsîn (Yakar, 2009: 998; Öztürk, 2016: 5). Destpêka zimanê Tirkî ya digel ferhengên menzûm ên duzimanî bi Erebi û Farisî çêbibe jî, pişt re digel zimanên curbicur ev xebat hatine domandin (bnr: Öztürk, 2016: 5). Di nav civakên rojhilata navîn de, digel fergengên menzûm ên duzimanî yê sêzimanî jî hatine nivîsandin hetta yeke şeşzimanî ji aliyê kesekî bi navê Yûsiv ve bi navê *Nisab-i Şeşzeban* hatiye nivîsandin (Karaismailoğlu, 1990: 60).

1.1.4. Kurtedîroka Ferhengên Menzûm di Zimanê Kurdî de

Wekî civakê din ên rojhilata navîn, di zimanê Kurdî de jî xebatên li ser ferhengên menzûm hatine kirin. Lê li gorî van zimanên derbasbûyî û li gorî belgeyên di destê Kurdologan de, ev xebat di zimanê Kurdî de hinekî dereng hatine kirin. Em dê li jêr bi awayekî kurt di derbarê van ferhengên menzûm de agahiyan bidin.

1.1.4.1. Nûbihara Biçûkan

Wekî ku ji belgeyên di destên Kurdologan de tê zanîn û dîtin berhema yekem a li ser rêbaza ferhengnivîsiya menzûm hatî nivîsîn *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî ye. Xanî ev behrem di sala 1683yan de û di 33 saliya xwe de nivîsandiye (Ertekin, 2017: 94). Ferhenga Xanî nêzîkî hezar peyvên Erebi û peyvên Kurdî ên beranberê wan dihewîne, ji sêzde beş û pêşgotinek kurt û ji dused û bîst malikan pêk tê (Ehmedê Xanî, 2008: 40). Xanî ev berhem, wekî ji navê wê jî diyar dibe, ji bo zarokên Kurdan nivîsiye. Ev berhem, wek materyalekê di medresyan de hatiye bikaranîn (Başaran, 2014: 54; Adak, 2014: 254). Dema zarokên Kurd ji xwendina cuzok, ema û Qur'an'ê derbas dibûn di destxistina ilm de zehmetî dikişandin. Lewra ji bo di ilm de pisporbûnê zimanê Erebi mercek bû. Ji ber ku, Xanî ev berhem bo zarokan nivîsandiye, navê wê *Nûbihara Biçûkan* daniye. Xanî vê yekê wiha tîne ziman:

Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê Nûbihara Biçûkan lê danî

Ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Wekî ji Qur'anê xilas bin

Lazim e li sewadê çavnas bin. (Adak, 2013: 254)

Digel vê armancê, Xanî di berhema xwe de li ser behr û kêşê jî sekiniye. Bi vê yekê dixwaze kesên meyla wan li helbestkariyê heyî, ji van kêş û behran agahdar bike. Ev behrem yekem pirtûk e ku ji bo perwerdeya zimanê zikmakî hatî nivîsîn. Ji ber ku ferheng ji bo zarokan hatiye nivîsîn, muellif di serê her beşê de şîretek daniye.

Heta dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf

Li dunyayê tu nabî ne meşhûr û ne me'rûf. (Qoxî, 2014: 17)

Gava ji aliyê muhtewayê ve em lê dinêrin em dibînin ku Xanî bi rêbazên pedagojîk ev behrem nivîsandîye û di derbarê perwerdekirina zarokan de xwedî agahî bûye. Lewra Xanî mijarên xwe li gorî “ji nêzîk ber bi dûr ve, ji ya hêsan ber bi ya dijwar ve” (Ehmedê Xanî, 2014: 22) nivîsandîne û di hînkirinê de ji hemwate, diywate, tezad û pîrskirinan îstifade kiriye (bnr: Öztürk, 2016: 23-7). Di qada Kurdolojiyê de hin xebat li ser vê ferhengê hatine kirin ji aliyê Kurdologan ve. Xebata herî muhîm jî ew e ku Qoxî bi navê *Gulzara Hemûkan* ev berhem şerh kiriye û digel tîpên Erebi çap kiriye û pişt re dîsa heman lêkolînerî peyvên Erebi û Kurdî digel hev dane û rêjeyên wan ên di malikan de wek pêrist dane. Ji bilî van, Zeynelabidîn Zinar di sala 1986an de, Tehsîn Îbrahîm Doskî digel *Mîrsadu’ul Etfalê* di sala 2010an de, digel ferhenga Yûsuf Zîyaeddîn Paşa jî di sala 1794an de hatiye çap kirin (Ertekin, 2017: 94).

1.1.4.2. Mîrsadu’l-Etfal / Şahrahê Kûdekan

Berhemek din ya bi awayê ferhengên menzûm ên di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatî nivîsîn *Mîrsadu’l-Etfala* Şêx Mihemed Kerbelayî ye. Kerbelayî di sala 1886an de li gundê Axtepeya girêdayîyê navçeya Çinar a Diyarbekirê (Bolelli û Ertekin, 2017: 28) hatiye dunyayê. Kerbelayî neviyê Şêx Abdurrehmanê Axtepî ye û ji ekola Axtepiyan e. Wekî Akdağ-Soylu diyar dikin du berhemên Kerbelayî hene. Yek *Dîwan*, ya din jî ferhenga wî ya bi navê *Mîrsadu’l-Etfal* ango bi navê din *Şahrahê Kûdekan* e.³

Ferhenga menzûm a Kerbelayî, ji destpêkek û 15 beşan pêk tê. Kerbelayî jî wekî Xanî di ser her beşê de malikek nivîsiye ku di termînolojiya ferhengên menzûm de ji bo van malikan qit’e tê gotin.

‘Ilim ez behrê insan dewletê dunya û ‘uqba ye

Kesê ‘alim muheqqeq tacidarê her du dunya ye. (Bolelli û Ertekin, 2017: 29)

Kerbelayî di destpêkê ango di muqaddîmeyê de navê berhema xwe daniye. Kerbelayî jî wekî kevneşopiya beriya xwe ev kevneşopî domandiye û peyva tîfal-zarokê pê ve kiriye:

Bi Mîrsadu’l-Tifal min kirye nîşan

Ji mewla min rica ye nef’ê îşan. (Pertev, 2012: 47)

Dema em li sebebê nezma kitêbê dinêrin em dibînin ku Kerbelayî jî ev behrem ji bo zarokên Kurdan nivîsiye. Lê bi awayekî taybetî ev ferheng ji bo birayê xwe û biraziyê xwe

³ Ji bo bêhtirîn agahî di derbarê Kerbelayî de bnr: Akdağ-Soylu, 2002: 7-10.

nivîsandiye. Di nav sebebê telifê de diyar dike ku ferheng bi zimanê Farisî û Kurdî ye. Sebebê nezma kitêbê weha ye:

Li ser Etfal û ewladê di Kurdan
Lîsanê Farisî û meqsedê wan
Muhemmed Eskerî yû Neqşibendî
Ew in ‘ilet ji vê tertîb û bendî. (Bolelli û Ertekin, 2017: 28)

Di nav metna Kerbelayî de diyar dibe ku di bin bandora Ehmedê Xanî de gelekî maye. Ev yek ji malika jêrîn diyar dibe:

Me her wek Newbuharê Şêxê Xanî
Esasê wê ji bo etfalê danî. (A.R.T., 2013: 20)

1.1.4.3. Gulzar

Ferhenga menzûm ya bi navê *Gulzarê* ji aliyê Îsmâîlê Bazidî ve hatiye nivîsîn. Bazidî di sedsalên hivdehem û hijdehem de jiyaye. Wekî ku agahiyên Kurdo ji Jaba vediguhezîne, Bazidî şagirdê Ehmedê Xanî bûye (Kurdo, 1992: 17).

Agahiyên di derbarê Îsmâîlê Bazidî de kêma in, lê wekî ku Kurdo neqil dike ferhengek menzûm ya bi navê *Gulzarê* nivîsandiye û ev ferheng ji sê zimanan pêk tê (Kurdo, 1992: 17). Ev ferheng ji aliyê xwe yê sêzimanî ve ji ferhengên din ên menzûm ên Kurdî cuda dibe. Zimanên wê Kurdî-Erebî-Farisî ne. Wekî Minorsky jî diyar dike, ev ferheng wekî ya Xanî di medreseyan Kurdan de hatiye bikaranîn (Minorsky, 1997: 114). Ferheng bi devoka Colemêrg û Bazidê hatiye nivîsîn (Ertekin, 2017: 95).

1.1.4.4. Du Rişte

Ev berhem ji aliyê Mela Ebdulkerîm Muderris ve hatiye nivîsandin. Li ser bergê ferhengê “Duruşte, ferhengê ‘erebî-kurdî be helbest” (Aykaç, 2016: 9) dinivîse. Ferheng bi zaravayê Soranî hatiye nivîsîn. Di malikên sebebê telifa ferhengê de muellif dibêje; musulman hemî bira ne û ji ber hindê divêt zimanê hevudu bizanin (Ertekin, 2017: 97) û di jînê de divêt bira ligel bira bin, li yek niştimanî, di nav hev de bin:

Hemû nişteciyê yek niştiman in
Eb zûbanê yekter bizanin

Bû jînê bira ligel bira da
Le yek niştiman le yek mawa da. (Ertekin, 2017: 97)

Di berhemê de bîst û yek beş hene. Di ferhengê de 1761 malik û 3618 peyvên Erebî û beranberiya wan a Soranî cih digire (Ertekin, 2017: 97) û berhem cara yekem li Sinê ya bajarê Îranê li çapxaneyê Întîşarata Kurdistanê di sala 1970î de hatiye weşandin (Aykaç, 2016: 9).

1.1.4.5. Ferhenga Quranê

Ev ferhenga menzûm di wextên nêzîk de hatiye nivîsîn. Ev ferheng rasterast li gorî mantalîteya Ereban ya li ser ferhengên menzûm hatiye nivîsîn. Lewra Ereban xebatên xwe yê ewil, yê li ser ferhengsaziyê ji bo fêmkirina Quranê kiribûn. Muellifê berhemê Mela Mehmûd Tîruwayî jî, ji bo heman mebestê berhema xwe di salên 2000an de nivîsandiye (Aykaç, 2016: 14).

1.1.4.6. Nûbihara Mizgefta Sîriyê

Ev berhem ji layê Ebdulsettar Rêkanî ve hatiye nivîsîn. Ferhengek bi Erebî-Kurdî ye û Kurdiya wê bi devoka Behdînan hatiye nivîsîn (Bolelli û Ertekin, 2017: 39). Di ferhengê de 1330 peyv hene û ferheng ji pêncî û çar wereqan pêk tê⁴.

1.1.4.7. Nûbihara Mezinan

Nûbihara Mezinan ji aliyê Dilbikulê Cizîrî (Abdulkadir Bingol) ve hatiye nivîsîn. Ferheng ji ferhengên din ên menzûm cudatir e, lewra ev ferheng li ser rîknê zimanê Tirkî-Kurdî hatiye nivîsîn. Ferheng di sala 2015an de hatiye weşandin (Aykaç, 2016: 9). Muellifê ferhengê di bin bandora Ehmedê Xanî de maye û dema navê ferhenga xwe lê dike, îlhama xwe ji Ehmedê Xanî digire (Cizîrî, 2015: 8). Cizîrî jî wekî şairên din ferhenga xwe ji bo Kurdan nivîsandiye, lê berevajiyê wan, wî ferhenga xwe ji bo mezinan nivîsandiye (Ertekin, 2017: 101). Sebebê telîfa berhemê weha ye:

Min xwest ji ziman re kim xebatê

Bona wejîna wê kim lebatê

Rizgar bikim ez nebîte wenda

Da ew nemirit li şehr û gunda

Hazir bikim ez bi Kurdî ferheng

⁴ M. Zahir Ertekin li ser vê ferhengê dixebite (Ertekin, 2017: 100).

Da ew di dinê de bit xwedî deng. (Ertekin, 2017: 100).

Ferheng herçendî di demek nêz de hatibe nivîsandin jî, şair ew li gorî kevneşopiya ferhengên menzûm li ser kêşa erûzê nivîsandiye. Ji destpêkek û du beşan pêk tê û ev herdu beş di nav xwe de binbeşan dihewînin.

1.1.3.8. Luxetnameyî Ehmedî

Ev ferheng mijara xebata me ye û nusxeya di destê me de bi navê *Kitab'u Ehmediye'yê* ye û ji layê Şêx Merûfê Nodeyî ve hatiye nivîsandin. Ji ber hindê agahiyên di derbarê vê ferhengê de, em dê di beşek serbixwe de li jêr bidin.



BEŞA DUYEM: ŞÊX MERÛFÊ NODEYÎ Û AGAHIYÊN DI DERBARÊ WÎ DE

2.1. Jiyanê Şêx Merûfê Nodeyî

Şêx Merûfê Nodeyî şair û alimek navûdeng yê edebiyata Kurdî ya klasîk e. Leqeba wî Merûf e (Mehmed Emin Zeki Bey, 1998: 361). Navên wî wek Şêx Merûfê Kose, El Şêx El Seyîd Muhemmed, Şêx Merûfê el-Berzencî, Şêx Merûf en-Nûdehî derbas dibe (Tanrikulu, 2016: 283; Mehmed Emin Zeki Bey, 1998: 361; Kavak, 2017: 42; Kavak, 2016: 158).

Malbata Şêx Merûfê Nodeyî di herêma Suleymaniyê de ji aliye dînî ve berbiçav bûye. Lewra silsileya wan heta şairê Kurd Baba Tahirê Hemedanî diçe. Malbata Şêx Merûfê Nodeyî “bi şecereya malbatî, bapîrê wî yê sêzdemîn Seyyîd Îsayê Berzencî kurê Seyyid Baba Elî Hemedanî ye, ku Seyyid Baba ‘Elî Hemedanî jî, birayê şa’irê mezin û navdar Seyyid Baba Tahirê ‘Uryanî.” ye (Bolelli û Ertekin, 2017: 30).

Gava di gotareke Farisî de navê Şêx Merûfê Nodeyî derbas dibe muellifê gotarê wekî jêrenot di gotarê behsa wî dike û wekî “Şêx Merûfê kurê Şêx Mustefayê kurê Şêx Ehmedê kurê Şêx Muhemmed Berzenciyê Nodehî” wî û malbata wî dide nasîn” (Dadger, 2007: 153). Şêx Merûfê Nodeyî ji herêma başûrê Kurdistanê ye. Gundê wî Nodê, gundek girêdayîyê Şehrezora navçeyabajarê Silêmaniyê ye. Nodeyî di sala 1753 de li vî gundê navborî hatiye dunyayê (Borekeî, 2008: 699).

Şêx Merûfê Nodeyî ewil digel bavê xwe dest bi xwendinê dike. Pişt re li ser daxwaza bavê xwe diçe bajarê Kalaçolanê û li wir di medreseya El Gaziyeyê de dixwîne (Kavak, 2015: 44). Piştî Kalaçolanê Nodeyî diçe Hazermerdê û li wir perwerdeya xwe didomîne (Mehmed Emin Zeki Bey, 362). Şêx Merûf ji Mela Muhemed b. el-Hac Hesen, Mela Evdila Beytûşî û ji Mela Muhemmed Xezaî derstan dibine. Nodeyî ji Mela Evdila Beytûşî û ji Mela Muhemmed Xezaî îcazetnameya xwe distîne.

Nodeyî ji aliyê edebî ve dimîne dibin bandora Beytûşî de (Mehmed Emin Zeki Bey, 362) ku ev yek ji helbestên wî diyar dibe. Piştî standina îcazetnameyê Nodeyî li gundê xwe Nodê dest bi muderisîyê dike (Kavak, 2015: 44). Lê piştî mirina muderisê wî Mela

Muhammed Xezayî dizivire Kalaçolanê û li wir muderisiya xwe didomîne û dibe rêvebirê pirtûkxaneyê Babanan.

Nodeyî demek şûn de ji bo xwendina tesewifê diçe Dehlîzê cem xalê xwe ê şêxê Qadirî Seyyid Abdurrezzak b. Seyyid İsmail el-Vulyânî (Kavak, 2015: 44). Nodeyî, piştî mirina xalê xwe diçe cem Şêx Elî ku ew jî şêxek Qadiriyan e. Şêx Merûf îcazetnameya terîqeta Qadiriyyê ji Şêx Elî distîne (Mehmed Emin Zeki Bey, 362).

Dema Nodeyî îcazetnameya terîqetê distîne, li Silêmaniyê dersan dide xwendevanan. Xwendekarên medreseyan tên intisabê wî dikin û bi rêya xwendekarên wî navûdeng dibe (Kavak, 2011: 142). Kâk Şêx Ehmed el-Berzencî, Şêx Huseyn el-Qâdî, Şêx Muhammed el-Berzencî, Şêx Feyzî ez-Zuhâyî, Şêx Mehmûd el-Kilderî, Mela Mehmûd el-Gilâlî, Şêx Mehmûd el-Gelezerdî, Şêx Huseyin es-Sitqî, Mela Ehmed el-Pîr el-Hasane xwendekarên Şêx Merûf ên herî bêhtir tên naskirin (Kavak, 2015: 45).

Digel geşedana şohreta wî ya di qada zanistan de, di warê civakî û siyasî de jî Şêx Merûf di herêmê de derdikeve pêş. Şêx Merûf di dema pevçûnên di navbera dewleta Osmanî û dewleta Îranê de nameyekê ji padişahê Osmanî Selîmê III. re dinivîse. Di nameya xwe behsa rewşa herêmê dike û ji ber nexweşiya rewşa siyasî dixwaze ber bi Şam an jî Qudîsê ve koç bike (Kavak, 2011: 142). Lê bersiva nameya wî nehatiye. Şêx Merûfê Nodeyî heta dawîya emre xwe li Silêmaniyê maye û di sala 1837an de wefat kiriye (Bolelli û Ertekin, 2017: 30) û piştî Şêx Merûf Nodeyî kurê wî Kak Şex Ehmed Berzencî bû postnişînê wî (Kavak, 2017: 43).

2.1.1. Perwerdeya Şêx Merûfê Nodeyî û Rola Wî ya li Herêmê di Jiyana Siyasî, Civakî û Olî de

Wekî hemî şair û muellifên edebiyata klasîk Şêx Merûf Nodeyî jî di medreseyan de ders dîtiye. Di pêşketina ilm û zanîne de rola medreseyan ji bo nivîskaran bêguman ne rolek kêr e. Lewra di pergala medreseyan de, zarokan di emrekî biçûk de dest bi xwendina medreseyê dikirin û dema di warê ilm û zanîne de dibûn pispor, îcazeta xwe ji medreseyan hildigirtin. Tabî ev tenê ne medreseyek e, heta şair îcazeta xwe digire ji dehan medrese û mamosteyan dersê distîne. Lê di perwerdekirina rojhilata navîn de dersa ewil ya zarokan bi rêya endamên malbatê dest pê dike. Şair û muellifê me jî, di zaroktiya xwe de ji bavê xwe ders standine. Pişt re li gelek deveran feqîti kiriye (Bolelli û Ertekin, 2017: 30).

Nodehî di medreseyan de ilmên wekî serf, mentiq, nehew, terkîb, edeb, hedîs, fiqih, eqîde, me'anî û hwd. dîtin. "Piştî derbaskirina tehsîla destpêkî, bi ilmê Erebi û mentiqê re

mijûl bû û ji wan îstifade kir. Çand û agahiyên berfireh yê Nodehî zêde hebûn, di zimanên wek Erebi û Farisî de feraseta wî hebû.”⁵ (Paşabadî, 2013: 50). Nodeyî îcazeya xwe ji Mela Mehemedê Xezayî distîne. Piştî Nodeyî di ilm de dibe pispor û îcazeya xwe distîne, ew jî dersan dide. Xwendekarek Şêx Merûf Nodeyî şairê mezin ê bi navê Evdîrehman Xalisê Telebaniyê Kerkûkî ye (Çakır, 2016:1347).

Di Kurdistana Başûr de heta salên 1800î terîqeta Qadiriye’yê terîqeta serdest û navdar bû. Di heman coğrafyayê de malbatên pêşketî jî, malbatên Berzencî û Sadatê Nehrî bûn (Bruinessen, 2003: 326). Silsileya malbata Berzenciyan li ser terîqeta Qadiriyyê bûn. Şêx Merûf jî wekî malbata xwe li ser vê terîqetê bû û di vî warî de xebatên olî û siyasî pêk anîne. Di heman demê de Mewlana Xalidê Neqşibendî (Şehrezorî û Bexdadî) çûye Hindistanê ji bo fêrbûna ilmê Îslamê. Piştî Mewlana Xalidê Neqşibendî ilmê xwe qedand û ji Hindistanê vegeriya Kurdistanê, ewil berê xwe da bajarê Silêmaniyê. Lewra Silêmanî di nav Kurdan de wek paytextek zanistê bû. Di sala 1811an de terîqeta Neqşibendiyan li başûrê Kurdistanê hatiye sazkirin (Bruinessen, 2003: 327) û digel sazkirina terîqeta Neqşibendiyan payeya terîqeta Qadiriyyê kêmbû. Ji ber hindê di navbera herdu terîqetan de gengeşî derketin û Şêx Merûfê Nodeyî û Mewlana Xalid bûn neyarên hev (Bruinessen, 2003: 334). Gava Mewlana Xalidê Bexdadî tê herêma Silmaniyê, di navbera wî û Şêx Merûfê Nodehî de pevçûn çêdibe û Nodehî zora wî dibe, berê Mewlana Xalid dikeve Bexdadê (Bruinessen, 2013: 380). Di vê têkbirinê de rola malbata Telebaniyan jî heye. Lewra di başûrê Kurdistanê de hem payeya Nodeyî gelekî bilind bû, hem jî malbatek wekî malbata Telebaniyan piştevaniya wî kiriye. Herçendî malbata Berzenciyan malbatek berbiçav jî be, gelê herêmê ji aliyê olî û polîtîk ve girêdayîyê malbata Telebaniyan bûn (Bruinessen, 2003: 328).

Wek silsile malbata Berzenciyan bi eşîreta Caf (Bruinessen, 2003: 333), hikûmeta Baban, malbata Telebaniyan, waliyên Osmanîyan û bi dewleta Îranê re têkildar bûn. Vê yekê di dewra Şêx Merûf de bi awayekî zelal em dibînin. Îlmê ku di qada ol û terîqetan de erkek payebilind dida Şêx Merûf, ew erk di qada polîtîk de jî dida. Hesên Hezretî û Sebah Qenberî di derbarê polîtîkaya Şêx Merûf ya digel van malbat û dewletan de weha dibêje:

Têkiliya Berzenciyan ya bi Xanedana Hikûmeta Baban re li ser bingeha vî siyasîyê dihate terif kirin. Şêx Merûf bi waliyên Osmanî yê Bexdadê re têkiliyên xweş danîn, ku navenda hemî polîtîkaya Berzenciyan siyaseta nisbetê vî dewletê bû. Siyaseta şêxên Berzenciyan bi mîrekên Babanan re xurt bû, lê divê bal

⁵ Wergera ji Farisî ji aliyê me ve hatiye kirin.

bidinê ku di usûlê hemî siyaseta Berzenciyan de têkiliyên wan yên bi dewleta Osmaniyan re ji yên Babanan çêtir bûn.

Bi vê yekê em Şêx Merûf digel Îbrahîm Paşa û li muqabilê Mehmûd Paşayê ewil yê girêdayîyê dewleta Îranê dibînin. Elbette divê ji pêwendiya Mehmûd Paşa bi Mewlana Xalidê reqîbê Şêx Merûf re xafil nebin. Şêx Berzencî girêdayîbûna xwe ya digel dewleta Osmanî û Babanan ji bo pêşketina armancên xwe ên terîqetî û karên xwe ên komî û şexsî dikir. (Hezretî û Qenberî, 2016: 234)

Şêx Merûf têkiliyên baş digel waliyê Bexdadê didane û ji waliyê Bexdadê dixwaze ku nehêle Mewlana Xalidê Bexdadî bi awayek rehet û serbest di Bexdadê rîtuêlên xwe yên terîqetî bike û bi vî awayî nahêle ku Mewlana Xalid ji xwe re murîdan çêke. Lê waliyê Bexdadê vê yeke napejirîne û li hember Mewlana Xalidê Bexdadî astengiyan dernaxe.

2.2. Berhemên Şêx Merûfê Nodeyî

Şêx Merûfê Nodeyî di qada zanistên muxtelif de xwedan feraset û xwedan zanîn bûye. Di qada berhemên olî de Şêx Merûfê Nodeyî muellifek afirîner bû (Edmons, 2003: 105). Zanînen xwe yên di derbarê van ilman de derbasî qada nivîskî kirine. Li gorî agahiyên Bolelli-Ertekin Şêx Merûfê Nodeyî 45 berhemên di mijarên cûr bi cûr de bi zimanê Kurdî, Farisî û Erebi li pey xwe hiştine (Bolelli û Ertekin, 2017: 30).

Nodeyî di gelek mijarên cuda de berhem nivîsandine. Ev berhem bi awayekî gelemperî bi zimanê Erebi hatine nivîsandin. Ji van berheman ferhenga wî bi Kurdî-Erebî ye. Bo numûne di derbarê Nodeyî û zanistan de Paşabadî dibêje “Wî di gelek zanistên dema xwe yên di rewacê de yên wekî serf û nehew, erûz, me’anî, beyan û bedî’, mentiq, isûl û ferayizê [riyazet] de qelemşorî kiriye û menzûmeyên giranbuha afirandine.” (2013: 50) û dîsa di heman mijarê de Bruinessen jî dibêje gelek berhem nivîsandine (2013: 380). Di gotarek Farisî de navê berhemek wî wek “Behr-el Ensab” derbas dibe (Hezretî û Qenberî, 2017: 232).

Di nivîsandina qesîdeyan de Nodeyî xwedî ferasetekê bûye. Lewra li ser qesîdeyekê texmîs nivîsandin ne karekî hêsan e. Nodeyî li ser qesîdeyek Îmamê Bûsîrî ya bi navê “Borde”yê texmîsek nivîsandiyê, bi zimanê Erebi. Ev yek jî dide xuyakirin ku Nodeyî bi qasî di ilm û zimanê Erebi de xurt, di hunera Erebi de jî xwedî feraset bûye (bnr: Paşabadî, 2013: 49-64). Baba Merdûx Rûhanî 34 çar berhemên Şêx Merûfê Nodeyî tespît kirine ku ew berhem ev in:

1. el-Ahmediyye fi tercümeti'l-kelîmati'l-Arabiyye bi'l-Kürdiyye (el-Ehmediye; wergera bêjeyên Erebi bo Kurdî)

2. Ezhâru'l-hamail fi's-salavâti'l-müştemile ale'ş-şemail (Ev pirtûk di derbarê selewat û şemailên Pêxember de ye)
3. el-Ağrab fi nazmi Kavaidi'l-i'rab (Ev pirtûk di derbarê nezma pirtûka Ibn Hîşa el-Ensarî ya bi navê Kavaidi'l-i'rab'ê de ye)
4. Avseku'l-ara fi's-salati ve's-selami ala hayri'l-vera (Ev pirtûk di derbarê selewatên bo Pêxember de ye)
5. el-Burhânu'l-celfî fî menakîbi's-Seyyid Ali (Ev pirtûk di derbarê menqîbe û pesnê Seyyid Elî de ye)
6. Tahmîsu Kasîdeti "Eaneme Îşen" (Texmîsa qesîdeya "Eaneme Îşen")
7. Tahmîsu Kasîdeti "Banet Suad" (Texmîsa qesîdeya "Banet Suad" Banet Suad qesîdeya Ke'b Bin Zuheyr e ku Zuheyr hatiye cem Pêxember û daxwaza efûyê ji Pêxember kiriye û ev ji bo Pêxember nivîsanditye)
8. Tahmîsu Kasîdeti бүрдетү'l-medîh (Texmîsa qesîdeya Bûsîrî ya di derbarê pesnê Pêxember de)
9. Tahmîsu Kasîdeti lamiyetu'l-acem (Texmîsa qesîdeya "lamiyetu'l-acem")
10. Tahmîsu'l- Kasîdeti'l-mudariyye (Texmîsa qesîdeya mudariyye)
11. Tahmîsu'l-Kasîdeti'l-hemziyye'l-Busiriyye (Nehatiye qedandin), (Texmîsa qesîdeya Bûsîrî)
12. Tahmîsu Kasîdeti "Ya men yera" (Texmîsa qesîdeya "Ya men yera")
13. Tarsîfu'l-mebânî fî nazmi't-tasrîfi'z-Zencânî (Nezma pirtûka tesrîfa Zencanî ye ku Zencanî di pirtûkê de gramera/serfa Erebi pexşan nivîsandiyê û Nodeyî kiriye menzûm)
14. et-Ta'rif bi ebvâbi't-tasrîf (Di derbarê serfa Erebi de ye)
15. Tenkîhu'l-ibârât fî tavzîhi'l-istiârât (Di derbarê hunera istiareye de ye)
16. Tenvîru'l-basâir fi't-tahzîr ani'l-kebâir (Di derbarê xwedûrkirina ji gunehên mezin de ye)
17. Tenvîru'd-damîr fi's-salavâti'l-müştemile ala'l-esmâi'l-beşîri'n-nezîr (Ev pirtûk di derbarê selewatan de ye ku li gorî her navekî Pêxember selewatek bi format kiriye)
18. Tenvîru'l-ukûl fî ahâdis-i mevlidi'r-rasûl (Di derbarê hedîsên di derbarê mawlûda Pêxember de ye)
19. Tenvîru'l-kulub fî medîh-i Allâmi'l-Guyûb (Ev pirtûk di derbarê pesnê Xwedê de ye)
20. el-Cevheru'l-esnâ fi's-salavâti'l-müştemile alâ esmâi'llahi'l-Hüsna (Ev pirtûk di derbarê selewatan de ye ku her li gorî her navekî Xwedê selewatek bi format kiriye)
21. el-Cevheru'n-nadîd fî kavâidi't-Tecvîd (Ev pirtûk di derbarê tecwîdê de ye)
22. Râhatu'l-ervâh fi's-salavâti'l-müştemile ala hasâisi'l-meliki'l-fettâh (Ev pirtûk di derbarê selewatan de ye. Her selewat li gorî taybetiyên Pêxember hatiye bi format kirin)
23. er-Ravzatü'l-ginâ fi'd-duâi bi esmâillahi'l-hüsna (Di derbarê diayan de ye. Dia bi navê Xwedê Esam-ul Husnayê hatine amadekirin)
24. Ravdu'z-zehr fî menakîbi âli Seyyidi'l-beşer (Ev pirtûk di derbarê menqîbeyên di derbarê malabata Pêxember de ye)

25. Zâdu'l-meâd fî mesâili'l-i'tikâd (ev pirtûk di derbarê bingeha baweriya Îslamê de ye)
26. es-Sirâcu'l-vehhâc fî medh-i Sâhibi'l-mi'râc (Di derbarê pesnê Pêxember de ye)
27. Sullemü'l-vusûl fî İlmi'l-usûl (Di derbarê metodolojiya fiqihî Îslamî de ye)
28. eş-Şâmilli'l-avâmîl (Ev pirtûk şîroveya pirtûka bi navê el-Awamilê ye ku ew jî di derbarê gramera Erebî de ye)
29. Şerhu's-sadr bi-zikri esmâi ehli'l-Bedr (Ev pirtûk di derbarê sebaheyên ku çûyîn cenga Bedrê de ye)
30. Şerhu Nazmi'l-istiârât (Şîroveya pirtûka bi navê Nezm-ul Istiareyê ye ku ew jî di derbarê hunera istiareye de ye)
31. Akdu'l-cevher fî's-salâti ve's-selâmi ala's-şeffî'l-muşaffî' yevme'l-mahşer (Di derbarê selewatan de ye)
32. Akdu'd-dürer fî mustalahi ehli'l-eser (Di derbarê termen ilme hedîsê de ye)
33. Amelu's-siyâge fî ilmi'l-Belâge (Di derbarê belaxeta Erebî de ye)
34. Gaysu'r-rabi' fî ilmi'l-Bedi' (Di derbarê hunerên ilme bedî'ê de ye û ev ilm jî di derbarê hunerên lefzî de ye)
35. Fethu'r-Rahmân fî'l-Meâni ve'l-Beyân (Di derbarê ilme meanî û beyanê de ye)
36. Fethu'r-Rezzâk fî ezkârî rafi'l-implak ve celbi'l-erzâk (Di derbarê wird û zikrên ku xizabiyê ji holê radikin û dewlemendiyê tînin de ye)
37. Fethu'l-mecîd fî İlmi't-Tecvîd (Di derbarê ilme tecwîdê de ye)
38. Fethu'l-muvaffîk fî ilmi'l-Mantuk (Di derbarê ilme mentiqê de ye)
39. el-Ferîde fî'l-akîde (Di derbarê bawerî û eqîdeya Îslamê de ye)
40. el-Ferâid fî'l-akâid (Di derbarê bawerî û eqîdeya Îslamê de ye)
41. Kasîdetu (Ey eslê hemî gerdûnê)
42. Kasîdetu (Salatu zi'l-celâli ebeden ala ittisal), (Qesîde)
43. Kasfdetu (Ya delilu'r-rukbi ilâ Necd kum fakat lâhet tiybetel-fayha), (Qesîde)
44. Katru'l-arid fî ilmi'l-ferâid (Di derbarê ilme mîrasê de ye)
45. el-Kutûfu'd-devânî fî hurûfi'l-me'ânî (Di derbarê wateya daçekên Erebî de ye)
46. Keşfu'l-esef fî's-salâti ve's-selâmi alâ Seyyidi ehli's-şeref (Di derbarê selewatan de ye)
47. Keşfu'l-ba'sâ bi ezkârî's-sabah ve'l-mesâ (Di derbarê zikrên sibê û êvaran tên xwendin de ye)
48. Kifâyetu't-tâlib Nazmu kâfiyeti ibn Hâcib (Ibn Hâcib di derbarê gramera Erebî de bi navê el-Kafîyeyê de pirtûkek pexşan nivîsandiye, Nodeyî jî ev pirtûk kiriye menzûm)
49. Nazmu âdâbi'l-bahs (Di derbarê ilmê munazereyê de ye)
50. Nazmu Risâleti'l-Adûdiyye fî'l-vad' (Risâleti'l-Adûdiyye pirtûkek di derbarê wedê de ye, Nodeyî kiriye menzûm)
51. Nazmu'l-arûz (Pirtûkek menzûme li ser ilmê erûzê)

52. Vesîletu'l-vusûl ilâ ilmi'l-usûl (Di derbarê metodolojiya fiqiha Îslamê de ye), (Kavak, 2011: 145-146)

52. 2.2.1. Kitab-u Ehmediye

Li ser vê berhemê du nusxe hene. Yek *Kitab-u Ehmediye* û ya din *Luxetnamey Ehmedî*. *Luxetnamey Ehmedî*⁶ di sala 2013an de ji aliyê Întîşarata Kurdistanê ve hatiye çap kirin. Nusxeya bi navê *Kitab-u Ehmediye*'yê jî hêj nehatiye çapkirin. Mustensixên herdu nusxeyan nayête zanîn. Lewra di derbarê nusxeyan zede agahî nînin û li ser nusxeyan jî agahî nehatine dayîn. Di vê xebatê de em dê digel menzûmeyên din, li ser cudahiyên van herdu nusxeyan jî bisekinin û xebatek edîsyon-kirîtkê bikin. Ji ber ku bingeha xebata me li ser nusxeya bi navê *Kitab-u Ehmediye*'yê ye, em dê wek serenav wê nusxeyê bikar bînin.

Ev ferhenga menzûm ji aliyê Şêx Merûf Nodêyî ve hatiye nivîsîn. Ferheng bi teşeya duzimanî hatiye nivîsandin. Ferheng, cara yekem ji aliyê Seyid Huseyn Hiznî ve di sala 1926an de li Rewandîzê hatiye çap kirin (Perteve, 2012: 26). Pişt re di sala 1970î de li bajarê Sine'yê ji aliyê weşanxaneyê Întîşarata Kurdistanê ve hatiye çapkirin. Wênedar kirin ji aliyê Ebdirrehman Mehmûd ve hatiye kirin. Piştî wê di sala 1953an de li Silêmaniyê ji aliyê weşanxaneyê Jîyanê ve hatiye çapkirin. Çapa nehem jî, li bajarê Sine'yê, ji aliyê Întîşara Kurdistanê ve di sala 2013an de hatiye çapkirin.

⁶ *Luxetnamey Ehmedî-Wênedar*, Danrawa: Şêx Merûf Nodê (Raskirdinewe, wênedar kirdinî be têkoşanî: Ebdîrrehîmî Mehmûdî) Çapa Nehom, 1391 (2013), Întîşarata Kurdistanê. Dema em vê nusxeyê wek çavkanî bikarbînin em dê di nav kevanekê () de Nodê binivîsîn.

BEŞA SÊYEM: JI ALIYÊ RUXSARÎ, NAVEROK Û ZIMÊN VE VEKOLÎNA KİTAB-U AHMEDİYE'YÊ

3.1. Ji Aliyê Ruxsarî ve

Di bin vî sernavî de em dê li ser aliyê şiklî yê nusxeyê bisekinin. Bi vê yekê em ê kêş, qafiyê, awayên nezmê yên di ferhengê derxin holê û van îzah bikin. Me li jor jî di derbarê wê nusxeyê de hin agahî dan îcar em ê wan li vir berfirehtir bikin.

3.1.1. Teşeyên Nezmê

Ferhenga bi navê *Kitab-u Ehmediye*'yê li ser du awayên nezmê hatiye saz kirin. Yek ji wan awayê mesnewî ye, ya din jî awayê xezelê ye. Agahiyên di derbarê van herdu awayên nezmê de dê li jêr bîn dayîn.

3.1.1.1. Awayê Mesnewiyê

Awayê mesnewiyê wek têgehê ferhengî wateya xwe ji peyva Erebi "isneyn"ê digire ku, ew jî bi wî zimanî tê wateya dulibî, dulib dulibê (Güllü, 2016: 63; Dilçin, 2013: 167). Ev terzê nivîsandinê ji aliyê hin taybetiyên xwe ve ji dîwan û mecmueyan cuda ye. Taybetiyên wê yên bi xasê wê hene. Bi vî cureyê nivîsînê menzûme û mijarên dirêj tîn nivîsandin. Herî bêhtir ev cure bi mijarên tahkiyeyî ve di hişê mirovan de cih digire, lê bi vî cureyê nezmê mijarên dîrokî, erdnigarî, siyerî, ferhengî jî gelek berhem hatine nivîsandin. Lewra taybetiyên wê yên weznê, wê fersendê didin muellifî ku bikare bi awayekî rehet teksta xwe li ser çend behr, kêş û serwayan bihûne. "Di mesnewiyan de wek serwaya xezelê her malik ne mecbûr e bi serwa be. Ji ber ku tengiya serwayê nayê kişandin mesnewî ji bo terza çîrokên dirêj û romanên teşeyê nezmê ê herî bikêr e" (Mengi, 2010: 467-8). Qafiyeya wesnewiyê bi awayê "aa, bb, cc," destpê dike û bi vî awayî her malik di nava xwe de bi qafiyeyî didome. Berhema me jî, bi vî awayî li ser cureyê mesnewiyê hatiye saz kirin. Lê di çend deveran de muellif bi awayê xezelê jî nivîsandiye. Mesnewî di berhemê de weha cih digire:

1/17 İbt binkel ceneb tenişt e
Qa' cîk e nerman û deşt e

2/17 Xemsûn xemsîn penca ye
Yenbu' çeşme mewde' ca ye

3/56 Ġalî giran rexiş erzan
‘Alim dana cahil nezan

3.1.1.2. Awayê Xezelê

Ev awayê nezmê di edebiyata klasîk de awayê herî bêhtir hatî bikaranîne. Bi vî teşeyê nezmê, helbestên ku hejmara malikên wan ne zêde hatine nivîsandin. Lewra qafiyeya wê li gorî ya mesnewiyê dijwar e. Di teşeyê xezelê de, herdu malikên ewil bi hev re hemqafiye ne û malikên din ji risteya xwe ya duyem ve bi herdu malikên pêşî ve tîn girêdan. Qafiyeya xezelan bi “a-a, x-a, x-a,x-a...” têtê hûnandin (Pala, 2004: 165). Di *Kitab-u Ehmediye*’yê de muellif çend caran ev awayê nezmê bikaraniye. Di du deveran de ev awa derdikeve pêşberî me. Herdu caran jî di beşa sêyem de ye. Ev awa weha derbas dibe di nusxeyê de:

3/4 Xeyl cemi‘ espha û suwareha
Keyl pîwan wezn kêşan fek zar

Ev yek di serê beşa sisêyan de destpê dike û çend malik bi vî awayî didomin. Pişt re carek din awayê mesnewiyê destpê dike, heta nêzî dumahîka metnê carek din awayê xezelê derdikeve holê. Lê di herdu caran de jî çend malikên mesnewiyê di navbera malikên bi şiklê xezelê hatî nivîsîn de cih digirin:

3/65 Feqihe zanî nehete taşî
Derebe lêda ketebe nuwîsî

3/66 Sami‘e bîstî feşile tersa
Men‘e neyhişt qetele kuştî

3.1.2. Serwa û Paşserwa

Cureyên edebî yên edebiyata klasîk gelemperî bingeha wan li ser kêşe, serwa û paşserwayê ava dibe. Bi van hêmanan, ahengek dikeve nava metnan û xwendina wan hêsantir dibe. Bêjeyên hevdeng û nêzdenk di nav heman peywendê de tîn cem hev û ev yek ahengê saz dike. Ji ber ku li jor me behsa kêşên erûzê yên metnê kirin em li vir xwe dubare nakin û em dê li ser serwa û paşserwayê û bisekin.

3.1.2.1. Serwa

Serwa di helbestan de ji bo sazkirina ahenge û xurtkirina wateyê têtê bikaranîn. Serwa hevdengiya tîpan ya di navbera du malikan de ye. Ev tîp, ji aliyê nivîsînê ve heman

tîp in lê ji aliyê wateyê ve ji hev cuda dibin. Serwa jî di nava xwe de dibin çend kategori ku ev kategori li gorî dubarekirina peyvan diyar dibin.

a) Serwaya Mucerred / Lawaz / Nîvîn

Ev serwa, di nav serwayan de ya herî kêr tîpan dubare dikeye. Di vê cureya serwayê di dawiya malikekê de tîpeke ji herdu risteyan hevdeng e. Di maliên jêr de di dawiya malikan de tîpek hatiye dubarekirin ku ev yek sarwaya lawaz saz dike.

1/41 Hêb dane qemh û hînte genim

Şeqî' sixwar neda şebnum

1/50 Kef leb-i dest e xed kulm e

Ekhel çawereşî bêsurme ye

2/77 Xeşyet û fereq hem xewf û wecel

Şefeq tursan e hem cibn û fesîl

b) Serwaya Murdef / Asayî / Tam

Ev serwa, ji dubarekirina dengdar û dengdêrekî pêk tê. Di vir de dengdêra ku di nava serwayê de, divê bêyî hereke hatibe nivîsandin. Di mînakên jêr de du tîpên di nava bêjeyan de hatine dubarekirin ku ev tîp serwaya tam pêk tînin.

1/122 Ehwel xêl e ebkem lal e

Ṭifl û şebî çî? mindal e

2/63 U'qar şerab e han şerabxane

Kas piyal e şamet nîşan e

3/58 Sûr wariş e haiṭ heşar

Hedîs suxen mismar bizmar

c) Serwaya Mueyyed / Zengîn

Serwaya muqeyyed, serwaya herî bêhtir tîpên hevdeng di nava xwe de dihewîne. Ev serwa sê û ji sêyan zêdetir tîpên hevdeng di nava xwe de dihewîne. Di *Kitab-u*

Ehmediye'yê de ev serwa gelekî hatiye bikaranîn. Wek di mînakên jêr de tê xuyan sê tîpan dubare kiriye.

1/111 Hucet burhan sulţan **delîl**

Melik paşa şağir **zelîl**

2/93 Selsel û selsal û aw-i xoş û **sard**

Şufr ism-i pêlwe şufret çî? **kard**

3/22 Îl bizuy kohî ner şewt **deng**

Tût tu we şîme xoh lewn **reng**

d) Serwaya Muesses / Tûnc

Di vê cureyê serwayê de, peyvek serbixwe di nava peyva din de derbas dibe. Ev peyv ji aliyê wateyê ve ji hev cuda ne ji aliyê dengî ve dişibin hevdu. Di mînakên jêr de bi peyvên “ahû-kahû, helan-lan” serwaya tûnc derketiye holê.

1/48 Wekr û ‘uşî ism-i hêlan e

Esed şêr e ‘erîn **lan** e

2/24 Zîby û ğezal rîm **ahû** e

Cemed sehûl xes **kahû** e

3/35 Ğurab û ğudaf qelereş e

Nûn masi ye damis **reş** e

3.1.2.2. Paşserwa

Dubarekirina dengan ya piştî serwayê ye. Ev hêman li ser wateya peyvan tu guherînan çênake. Bi dubarekirina van aheng xurttir dibe. Di dawiya risteyan de ev yek gelekî tê bikaranîn. Di *Kitab-u Ehmediye*'yê de ev cure, di halê qertafan de hatiye bikaranîn. Wek peyvek serbixwe nehatiye bikaranîn.

1/43 Cewz guwîz e kewz çuwale **ye**

Mihwel tişl-i yeksale **ye**

2/42 Bered hem xew e hem serma **ye**

‘Izq îşûy darxurma **ye**

3/25 Çîst cirzgêzer û minşef şen e
Ref refe ye kuwet rewzen e

3.1.2.3. Serwayên bi Cînasê

Cînas, di edebiyata klasik de wek hunerek edebî hatiye bikaranîn. Bi rêya vê hunerê helbestên edebiyata klasîk bi awayekî rehetir tên xwandin. Ji ber ku ev hunera edebî muzîkalîteyekê diêxe nava helbestan û helbest bi rêya kêş, serwa û cînasan rîtmekê dihewînin. Di nusxeyê de jî çend cureyên vê hunera edebî hatine bikaranîn.

a) Cînasa Muzeyyel

Di vê cînasê de, eger di dawiya du bêjeyan de tîpek ji bêjeya din zêde be cînasa muzeyyel derikeve holê (Kocakaplan, 1992: 30).

1/87 **Bazî baz** e başiq was e
Teñîn ard e reñî aş e

b) Cînasa Mukerrer

Di vê cînasê de, ji aliyê nivîsîn û bilêvkirinê ve bêjeyek divê di nava bêjeyek din de cih bigire (Aktaş, 2005: 297). Wek ji nav jî diyar dibe div ê cînasê de peyvek bi tamamî di nav peyva din de tekrar dike. Di mînaka jêr de peyva “sî”yê di nav peyva “qeysî”yê de derbas dibe.

2/7 Şelasûne şelasûne **sî**
Kîşmiş kîşmiş mişmiş qeysî

c) Cînasa Lahik

Ji bo vê cureya cînasê cînasa muteqarib jî tê gotin. Di vê cînasê de di du bêjeyan de tîpek an jî du tîp ji hev cuda ne. Ev cudahî li nivî, pêşî û paşiyê jî be, dibe cînasa lahîk. Di ferhengê de ev cînas gelekî hatiye bikaranîn.

2/122 Şulşul faxite kotre **barîk** e
Ġasiq û sañî şew-i **tarîk** e

1/74 ‘Esced cewher e hem **zêr** e
Tîrs kagez setrd **nêr** e

d) Cînasa Tam

Du peyv ji aliyê nivîsîn û xwendinê ve wekî hev bin lê wateya wan ji hev cuda be cînasa tam ji wan dertê. Di vê cînasê de peyv, tîp, heymara tîpan û hereke dubare dîkin. Di malika jêr de “kule” heywan e “kul e” kesê xeberên nexweş dideye.

2/74 Kelîl û naî keltêg **kul e**

Fereş pepûle ceradet **kule**

3.1.2.4. Hejmara Beş, Malik û Peyvan

Di vê nusxeyê de beşa yekem bênav e. Ji ber hindê em ê wê wek beşa yekem binav bikin ku em bikarin di derbarê malikên wê de rêjeyê bidin. Ji bilî wê du beş hene û navê wan di metnê cih digire.

Beş	Malik	Hejmara Peyvên Erebi
Beşa yekem	141	570
Esmâ-ul ‘Eded	183	546
Qete ‘eta Axir	75	304

3.2. Lêkolîna ji Aliyê Naverokê ve

3.2.1. Pergala Pedagojîk

Ferhengên menzûm ji aliyê kesên perwerdeya medreseyan dîtine ve hatine nivîsîn. Medrese jî wekî her avahiya perwerdeyî xwedî hin rê, rêbaz û pergalan bûn. Kesên di nav vê pergalê de perwerde didîtin di xebatên xwe de rêbaza van medreseyan emilandine. Ferhengên menzûm di eslê xwe de ji bo perwerdeya zarokan hatine nivîsandin. Ji ber hindê kesên ev ferheng nivîsandin aliyê ferhengan ên perwerdeker, ji derveyî mijarê nehiştine. Ferhengnivîsan ferhengên xwe li gorî pergalê pedagojîyê nivîsandine. Ev pergal ji hêmanên wekî tezad, kom û parçe, gelemperî û taybetî, ahengek xurt, pirsîkirin û ji mijarên wekî wan pêk dihat. Muellifê *Kitab-u Ehmediye*’yê jî wekî berhemên din rîknê xwe li ser van ava kiriye.

3.2.1.1. Tezad

Tezad di edebiyata klasîk de wek hêmanek hunerên edebî tê emilandin. Di ferhengên menzûm de ev yek ji bo hêsankirina ezberê tê bikaranîn. Lewra hêmanên zidên hev gava li cem hev bin ango di heman kontekstê de bin hingî zûtir tîni hişê mirov û ev yek jibîrkirinê heta astekê ji holê radike. Lewra “eşya bi zidên xwe tîni nasîn. Têgehên zidên hev gava tîni bikaranîn wateyê bihêz dikin (Gönel, 2011: 176).” Di *Kitab-u Ehmediye*’yê de ev rêbaza pedagojîk gelek caran hatiye bikaranîn:

1/56 Ebyed **spî** ye eswed **reş** e

Ezreq şîn e nesîb beş e

2/81 Şeyf û qeyz havîn e rebî' behar e
Başın **penhan** e zahir **diyar** e

3/59 Cedîd **taze** qedîm **kuwn** e
Meşhûn pur e duhn rûn e

3.2.1.2. Têkiliya Parçe û Komê

Agahiyên ku di peywenda parçe û komê tèn bikaranîn bêhtir mayînde dibin û zûtir tèn jiber kirin. Têkiliya parçe û komê ji aliyê perwerdekirinê ve rêbazek gelekî muhîm e (Karahan, 2009: 27). Lewra hişê xwendevan ji parçeyê ber bi komê ve agahiyan jiber dike. Di dibistan û medreyan de jî ev pergala hatiye bikaranîn. Şêx Merûfê Nodeyî jî, bi vê hişmendiyê ev rêbaz di berhema xwe de gelekî emilandiye:

1/1 Re's **ser** e 'eyn **çaw** e
Beden **qaleb** ism naw e

1/2 Enif **lût** e hacib **burû**
Fexiz **ran** e rûkbet **ejnû**

3.2.1.3. Têkiliya Gelemperî û Taybetê

Di têkiliya gelemperî û taybetiyê de Şêx Merûfê Nodeyî li ser rêbazekê, bi awayekî bibiryar neçûye. Carinan têkiliya gelemperî û taybetiyê û carinan têkiliya taybetî û gelemperiyê bikarîname. Ev yek bi tiştên bi hev re têkildar ve sêwirandiye. Di malikên jêr de, di malika ewil de, pêşiyê behsa rojê kiriye û pişt re heyv pê aniye û di malika din de ewil behsa bizinê kiriye û pişt re karik pê hatiye. Lê helbet divê neyê jibîrkirin ku di vir de armanek jî sazkirina ahengê ye. Muellif ji sazkirina ahenge dibe ku ev yek bi zanebûn kiribe. Lewra ji bo sazkirina ahengê muellifan li ser peyvan guherîn kirine.

1/38 Şems **rûj** e qemere **mang** e
Dirhem dirm daniq dang e

3/20 Hebetul xedra belê qezwan buwed
We'1 **nêrî bizin** kohî cedî **kar**

3.2.1.4. Rêbaza Pirskirinê

Ji bo girêdana hişê mirov bi metnê ve ev yek muhîm e. Lewra bi vê rêbazê, muellif nahêle hişê xwendekar ji ser mijarê qut bibe. Muellif bi pirsan, hişê xwendekar li ser metnê digire. Bi vî awayî “monotoniya di nava metne de ji holê radike û hişê xwendevan çalak dike (Köken, 2002: 94).” Şêx Merûfê Nodeyî jî ev metod gelek caran bikaraniye. Nodeyî ev yek ne bi tesadufî kiriye. Lewra ev pirs di nav metne de di wereqên cuda de tîr pirsîn:

1/60 Xuf **çi?** mesh e midas sol e
‘Amir awa gamir çol e

2/52 Mik‘eb **çi?** sol e xiram pêştên e
Hemyan hebnane wikaza ribên e

3/34 Hesa **çi ye?** berd-i çûk e
Enûk eħmeq cem‘î nûk e

3.2.2. Mijarên Serbixwe

Mijar	Hejmar	Mijar	Hejmar
Reng	9	Wext	18
Ol/Bawerî	5	Rewşa Hewayê	13
Mekan	18	Mucewher û Xeml	22
Bergeh û Alî	8	Aletên Kevn	17
Pîşe	5	Cil û Berg	9
Endamên Laşê Mirov	50	Xwarin - Vexwarin	34
Kozmolojî	3	Hejmar	18
Fîzyonomî	13	Nebat	42
Endamên Malbatê	24	Ajal	63

Tablo ji bo rêjeya mijarên serbixwe hatiye amadekirin. Muellifê ferhengê Nodeyî hin mijar bi awayekî kurt nivîsandine. Lê di hin mijaran de hin peyvên ku hatine bikaranî bi awayekî dewlemend hatine nivîsandin. Hin mînak bi peyvên Erebi ên cuda hatine mînak dan. Ev mînak dê di jêr de bîr dayîn.

3.2.2.1. Reng

Di *Kitab-u Ehmediye*'yê de rengên ku hatîn bikaranîn rengên sereke ne. Mebest ji vê yekê angorengên wek porteçalî, eflatûnî û hwd. nehatine bikaranîn. Bo numûne rengê reş û spî di gelek malikan derbas dibin. Rengên reş, spî, kesk, şîn, zer û sor derbas dibin. Ev reng rengên di jiyana rojane de tên xuyanin. Di malikên jêr de Şêx Merûfê Nodeyî weha reng bikaranîne.

1/56 Ebyed **spî** ye eswed **reş** e

Ezreq **şîn** e nesîb beş e

1/57 Ezfer **zêrd** e ehmêr **sûr** e

Qerîb nizîk be'îd dûr e

1/58 Ehwê **reş** e exder **sewz** e

Halik **reş** e tûlheb **kewz** e

3.2.2.2. Dîn

Muellifê berhemê di derbarê ol û baweriyên de zêde agahî nedane. Di metnê de tenê çend dîn derbas dibin. Ji bilî dînan, ji bo kesên nebawer û xwedî bawerî jî hin wesf bikaranîne. Dînen ku di metnê de derbas dibin weha ne:

2/65 Qudûm teşwî ye fas belê tewr e

Yehûdî **Cû** e Neşranî **Gewr** e

3/19 Şewmî'e çî? me'bed-i **Neşraniyan**

Hem helû ye merbe' û menzil hewar

2/83 'Ebher nerges e hem yasemîn e

Muslim **musulman** zendîq **bêdîn** e

Di mînaka duyem de muellif, di derbarê perestgeha Neşraniyan de agahî daye. Di malika sêyem de jî kesên nebawer wekî zendîq hatine wesifandin û di malikekê de peyva ecnebî hatiye bikaranîn.

3.2.2.3. Mekân

Di derbarê mekanan de agahî gelek nehatine dayîn. Wekî nav peyva bajar di çend deveran de derbas dibe, lê wekî navekî taybet cih û mekanên di metnê de gelekî cih

nagirin. Mekanên wekî Misr, Mekke û Medîneyê di metnê derbas dibin. Dibe ku ev bajar ji bo girîngiya wan a dînî hatibin dayîn. Wek mekan peyva dê jî derbas dibe, lê ev yek tenê wek peyvê derbas dibe. Wek navek taybet navê tu deran derbas nabe.

1/114 **Mişr** û **Medîne** gewre şar
Mescid mizgewt e sûq bazar

2/134 Qurbet t a'et qirbet çi? **kunde** ye
Feqîrî u 'dm iqlal faq e

1/121 Fec û terîq sebîl rê ye
Beled **şar** e qerye **dê** ye

3.2.2.4. Bergeh û Alî

Ji bo bergeh û aliyan peyvên wekî jêr, jor, çep û şimalê hatine bikaranîn. Peyva rastê di metnê de derbas dibe lê ev yek ji derveyî vê mijarê ye. Lewra konteksta wê li ser xwar û rastbûnê ye. Bergeh û alî:

3/9 Weqt-i êwar 'eşîye hem eşîl
Fewq **jor** teht **zîr** û **çep** yesar

2/96 Debûr deşebah şimal **şemal** e
Şehz û mesele suwal suwal e

Di malikekê de peyva şariqê hatiye bikaranîn, lê ev yek ne ji bo alî, ji bo rojê hatiye bikaranîn. Di malikekê de jî peyva çepê, rasterast ji bo aliyê bakur hatiye bikaranîn:

3/10 Çep **şimal** pêş qudam û emam
Pes wera û xelf dan hemsaye car

3.2.2.5. Pîşe

Di metne de kê m pîşe cih digirin. Ev pîşe jî bi rêya tewsfîkirinê hatine bikaranîn. Ev pîşe yê wekî hesinkar, şivan û nêçîrvan in. Di metnê de weha diborin:

1/118 Kûr kûre ye nar agir e
Qeyn û hedad **asinger** e

2/120 Qenaş û şeyad **nêçîrwan** e

Reht her le sê heta nûyan e

3.2.2.6. Endamên Laşê Mirovan

Di berhemê de gelek endamên laşên mirovan derbas dibin. Ji vî aliyê ve ferheng gelekî dewlemend e. Endam di nav metnê de hatine belav kirin. Di serî de muellif behsa çend endaman dike û pişt re di nav metnê de jî car car muellif wan dinirxîne. Endamên wekî poz, dev, zik, çav, dest, ser, por, tilî, simbêl, enî, çene, neynûk, mû, şan ango mil û hwd. derbas dibin. Mînak:

1/5 Zehr **pişt** e ketif **şan** e

Şefe **lêw** e sin **didan** e

1/24 Kebid **cevg** e tîhal **sipl** e

Qelb û fûad zemîr **dil** e

3.2.2.7. Kozmolojî

Kozmolojî di metnê gelekî kêr derbas dibe. Muellif behsa stêrk, heyv û rojê kiriye, lê li ser gerstêrk û felekan nesekiniye. Wekî ku me tespît kirî, di metnê navên qemere, şariq, necm û kewkeb û bedrê” derbas dibin.

1/37 Necm kewkeb **estêre** ye

Reğîf çi ye? kulêre ye

1/38 Şems **rûj** e qemere **mang** e

Dirhem dirm daniq dang e

3.2.2.8. Fîzyonomî

Nodeyî di derbarê fîzyonomiyê de gelek tewsîf kirine. Ev yek hem ji aliyê baş ve hem jî aliyê nebaş ve. Ev fîzyonomî wek “sist, çespan, kor, lal, xêl, ker, leîm, rijd, rûdestşel, bêling, goya, yekdest û yekçav” bikaranîne. Mînak:

1/44 ‘Ema **kowîr** e eşem **ker** e

M‘ez bizin n‘ece mer e

3.2.2.9. Endamên Malbatê

Endamên malbatê û mirovên bi malbatê re têkildar hatine bikaranîn. Endamên malbatê di nav nusxeyê de di beşa ewil de gelekî cih digirin. Lê endamên malbatê di beşên

din de kê m cih digirin. Endamên ku derbas dibin hinek jê ev in: “bav, dayîk, keç, kur, zarok ango mindal, jin, xezûr, zava, xal, xalet, mam, metik, nenk ango dapîr” û hwd.

1/100 ‘Emet **pûr** e **xuşk-i bawk** e
Xalet **pûr** e **xuşk-i dayk** e

2/99 Xeten **zava** ye sihr **xezûr** e
Milik paşa ye me‘zûl mazûl e

3.2.2.10. Dem û Wext

Dem û wext di nav berhemê de belavbûyî hatine dayîn. Dem û wextên derbas dibin hem demên rojê hem jî demên salê ne. Dem weha hatine bikaranîn:

2/81 Şeyf û qeyz **havîn** e rebî‘ **behar** e
Başin penhan e zahir diyar e

3/54 ‘Inan çî? Deste celew e
Muqmin **şew-i** mange şew e

3.2.2.11. Rewşên Hewayê

Di vê mijarê de muellif kê m agahî dane. Li ser berf û baranê sekiniye, navê “sarî” jî derbas dibe, lê nediyar e ku ev yek ji bo rewşa hewayê be. Lewra di malikê dibêje, sarî ew kesê bi şev derdikeveye. Îcar ev kesê şevê derdikeve dibe ku navê xwe ji rewşa hewayê jî standibe. Lê di mijara baranê de behsa rewşa barîna wê kiriye. Nerm bibare navekî û tund bibare navekî din digire. Numûne:

2/86 ‘Endelîb bulbul şalûl balûk e
Tel çî? **baran-i ze‘îf** û **sûk** e

2/40 Bered terze şelc **befr** e
Maide û sufre sifr e

3.2.2.12. Mucewher û Xeml

Di vê mijarê de muellif gelek mînak nedane. Lê mînakên hatîn dayîn jî, di çend malikan de derbas dibin. Wekî zêr û zîvê, ev herdu çend caran derbas dibin. Gelek navên cuda ji bo zêr hatine dayîn. Ev weha ne: “Zehab, nuðar, ‘esced, sinwed”. Mucewher û

xemlên hatîn dayîn wekî “zêr, zîv, dirav, dînar, gewher, lu’lu’, dur, mirarî, tibr, kildan, mîrat”ê derbas dibin. Mînak:

1/45 Zeheb **zêr** e fişad fidir **zîv** e
Cebel kêw e wadî şîv e

2/60 Cewher **gewher** e lu’lu’ **mirwarî**
Minseat ‘eşa ‘uşfu panarî

3.2.2.13. Aletên Kevn

Di mijara aletên kevn de Şêx Merûfê Nodeyî hinek aletên şêr dane. Di derbarê tiştên ji hêsin çêdibin de mînak dane. Ev alet weha ne: “şûr, şûrê buran yanî şûrê tûj, rim, tîr, sertîr, peykan, das, micref, zincîr, ‘emame yanî kumikê bizirx, metal, kemend, dav, mirwet, kevan”. Mînak

1/20 Neşl hem ism-i **şimşîr** e
Wecne kulm e neblet **tîr** e

1/93 Mi’wel **zengen** û mincel **das** e
Cufnet kêlan e hem kas e

3.2.2.14. Cil û Berg

Di derbarê cil û bergan de Nodeyî gelek agahî nedane. Navê cilê wek cil derbas dibe û wekî din ji bo cil û bergan mînakên wekî “sol, kulaw ango kulav, lifke, derpî, kiras, kewa, pelas, piştên, mêzer, hebnane” hatine dayîn. Di malikan de wiha derbas dibin:

2/51 Qeba **kewa** ye qemîs **keras** e
Serawîl **derpî** mish **pelas** e

2/52 Mik‘eb çi? **sol** e xiram **pêştên** e
Hemyan **hebnane** wikaza **ribên** e

3.2.2.15. Xwarin û Vexwarin

Xwarin ne kêm ne zêde hatine dayîn. Çend mînak derbas dibin. Di du malikan de Nodeyî xwarin kategorîze kirine. Yanî xwarinên şêv û yên nava rojê. Ji bilî wê, du sê

mînakên xwarinê hatin dayîn. Mînak weha ne: “şî’îre, nîsk, nok, birinc, tehîn, hingivîn, gezo, dibs, kebab”.

1/8 Şe‘er **mû** e qetûn **lok** e
‘Edes **nîsk** e hûmus **nok** e

3/43 Marin çi ye? nerme guwê e
‘Eşa **te‘am-i şewê** ye

3/44 Ğeda **te‘am-i şubhe** ye
Ne‘em ecel ceyr we ye

Di derbarê vexwarinan de Şêx Merûf mînak zehf kêr dane, lê di derbarê avê de çend mînak dane. Wekî ava sar, ava xoş. Ji bilî wê şerab û şîr derbas dibin. Bo numûne:

1/97 Bedr mang-i şewîçarde
Wird û şebim **aw-i sard** e

1/138 Ğedîr kolaw burket burk e
Şehba **şerab** e xel **sirke**

3.2.2.16. Hejmar

Hejmar di berhemê bi awayekî sîstematîk hatine dayîn. Nodewî ewil ji hejmara yekê heta dehê yek bi yek hejmar nivîsandine. Pişt re bi deh deh hejmar zêde kirine. Bi vî awayî heta sedî hejmar nivîsandine. Lê hejmarên ku yek bi yek hatine dayîn jî bi du, sê navên hejmaran ên Erebi hatine dayîn. Bi vî awayî mijara hejmara dewlement kiriye.

2/1 Waħid **yekî** îsneyn **duwe**
Hey zinduwe meyt mirduwe

2/17 Xemsûn xemsîn **penca** ye
Yenbu‘ çeşme mewde‘ ca ye

Piştî sedî rasterast xwe avêtiye hezarî û ji van pê ve hejmar negotîne.

2/2 Şelaşe sê ye erbe‘ çuwar e
Miat **şed** e elf **hezar** e

3.2.2.17. Nebat

Di nav mijarên sereke de, mijarek ji mijarên herî dewlemend mijara nebatan e. Mueliif di berhemê de hem dar nivîsandine, hem kulîlk, hem jî fêkî. Di nav daran de darxurme gelek çend caran derbas dibe. Nebatên navên derbas dibin hinek jê ev in: “darxurma, tirî, gul, yasemîn, nêrgis, binevş, heşîş, giya, benc ango giyayê tiryakê, dar, qeysî, hirmî, bişko, çînaw, helû, mêxek, sidre, dara nebqehê, pîvaz, gûz, sîr”.

2/14 Her germa ye qer serma ye
Nexl û nexîl **darxurma** ye

2/107 Burmet dîzî ye mircel mencil e
Zer' ism-i **çînaw** e sunbel **gul** e

1/106 Hûblet şimlî kemûn zîr e
Beşel **pîvaz** e sûm **sîr** e

3.2.2.18. Ajal

Mijara herî dewlemend û berfireh mijara heywanan e. Şêx Merûfê Nodeyî gelek caran heywan bi teswîfan îzah kirinê. Di derbarê menzinbûn, biçûkbûn û cureyê wan de agahî dane. Ev heywan hem yên kedî, hem jî yên kovî ne.

2/116 Selef **bêçwe kew** şebwet **dûpişk** e
Şîşr **bêçwe mar** şewabe **rişk** e

Di nav heywanan de du sê heywan zehf derdikevin pêş. Nodeyî di gelek malikan de behsa van heywanan dike. Bo mînak gelekî behsa şêr, mî, bizin û kewê dike. Digel gelekî derbasbûna navê van, gelek navên Erebi jî ji bo van heywanan hatine dayîn. Çardeh navên şêr derbas dibin. Ew nav weha ne: “Leys, heyder, deyxem, qesweret, heydere, xezenfer, usame, sarix, lebwet, şibl, sîd, sumeydî, dirxam û esed”.

1/86 Leyş heyder deygem **şêr** e
B'el şewher fehl nêr e

Wekî zaravayê Kurmancî ajalên nêr, mê û yên zayenda bi peyvê nayên ferq kirin nivîsandine. Ji ber ku heywan gelekî derbas dibin em wan li vir rêz nakin. Tenê em ê du sê mînakan bidin û yên dî di nav metnê de li jêr dê bîn dayîn.

2/32 'Ermût û kemusra hermê

Feres esp e çî nêr çî mê

3.3. Ji Aliyê Zimên ve

Ferhenga menzûm *Kitab-u Ehmediye* ji aliyê xwe yê zimên ve jî wekî beşên din ferhengek têr û dewlemend e. Muellif di ferhengê de cih daye gelek mijarên zimanî. Di ferhengê de navdêr, lêker û cureyên lêkeran, hevalnav, zayend, hoker, daçek û mijarên cuda hatine bikaranîn. Di vê beşê de em dê li ser van mijaran rawestin.

3.3.1. Navdêr

Ferheng di nav mijarên xwe de herî zêde bêjeyên navdêr dihewîne. Di hersê beşên ferhengê de jî bêjeyên navdêr bêhtir derdikevin pêş. Ji bo hînkirina zimanekî, bêje gelek muhîm in. Muellif jî di ferhengê de gelek bêje bikaranîne ku hişê xwendevanan ji aliyê bêjeyan ve tijî bibe. Mînak ji bo navdêran:

1/35 Şelût **nuwîj** e azan **bang** e

Sene **sal** e şehr **mang** e

2/23 Nuḥ niyah **girye** û **zarî**

Tuḥfe û hedye **diyarî**

3/3 Siqṭ **bal** rîş **per** ziq **xîk** e

Cîfe **laş** e neḥî **xîk** e 'ed **şumar**

3.3.1.1. Navdêrên Hevwate

Di fêrkirina zimên de ev mijar gelek sûdmend e. Lewra wekî di peyva şêr de me dîti li ser peyvekê xwendevan wateya gelek peyvan hîn dibe. Ev jî, hemî peyvên ku li ser heman wateyê di hişê xwendekar de şematîze dike û xwendevan li hember van peyvan ji zehmetiyekê xilas dibit. Şêx Merûfê Nodeyî jî di ferhengê de girîngiya vê mijarê bi awayekî eşkere derdixe pêş. Lewra di gelek peyvan de, ji vê mijarê îstifade kiriye. Bo mînak:

1/22 **Helq** û **ḥulqûm bulgûm** gerû

Ḥût masi ye 'elq zerû

3/17 **Hîzb û sirb û ʔaîfe firqe** guruw
Meret û mereteyn yekbar û dubar

Nodeyî ev yek di mijara hînkirina hejmaran de gelekî bikar îname. Di hejmarên deh bi deh zêde dibin de ev yek bi awayekî serkeftî emilandiye:

2/20 **Şemanûn şemanîn** heştad e
Telmiz şagird e ustas ustad e

3.3.1.2. Navdêrên Dijwate

Peyvên dijwate di fêrkirina zimên de cihekî girîng digirin. Xwendevanên ferhengê, du peyvan bi hev ve girêdidin û bi wî awayî jiber dikan. Gava hînî navdêrekê dibin têkiliyê di navbera navdêra din de jî datînin û ev yek karê jiberkirinê hêsantir dike. Muellif, wekî mijara navdêrên hevwater, ev mijar jî di gelek malikan de bikarîname. Ev yek li ser mijarên cuda kiriye. Di mijara endamên malbatê de mînakên weha emilandine:

1/79 Behr û dama yem derya ye
Uxt **xuşk** e ex **bira** ye

Ji bo mijarên baş û nebaş du mînakên weha bikaranîne:

1/77 Redî xerab ceyd çak e
Xebîs **pîs** e nezîf **pak** e

Di mijara bergeh û aliyan de:

3/9 Weqt-i êwar 'eşîye hem eşîl
Fewq **jor** teht **zîr** û çep yesar

3.3.1.3. Navdêrên Nêzdeng û Nêzwate

Di navbera navdêrên nêzdeng û nêzwate de têkiliyek xurt heye. Gava xwendevan hînî vê têkiliyê dibe, bi rêya wê hêsantir van peyvan jiber dike. Ev têkilî jî, ji bo xwendevan dibe kodek jiberkirinê. Ev yek di sazkirina ferhengan de gelekî tê bikaranîn. Nodeyî wekî ferhengnivîsên din kevneşopiya wê domandiye. Mînak ji bo navdêrên nêzdeng:

1/43 **Cewz** guwîz e **kewz** çuwale ye
Mişwel tîfl-i yeksale ye

3/39 **Remad** çi ye? xulemêş e
Remed be Kurdî çawêş e

Ji bo yên nêzwate jî em dikarin mînakek weha bidin:

2/82 Qirtas **kağed** e werqet çi? **per** e
Şerşer bay-i sext e ruxam mermer e

3.3.2. Hevalnav

Di ferhengê de, ji bo îzahkirina hin bêjeyên Erebi muellif serî li bikaranîna hevalnavên Kurdî daye. Ji zimanê Erebi hin bêje bijartine û ji bo baş bide fêhm kirin, bi rêya hevalnavan ew bêje îzah kirine. Mînak ji hersê beşên ferhengê:

1/139 Xemr û mudame şerab e
Yetîm **mindal-i bêbab** e

2/89 Beğel ustur e çarewî semend
Şeref bulundî hem **cîk-i bulund**

3/52 Lucam ligawe xişam hewsar
Rakib belê **wuştur suwar** e

3.3.3. Zayend

Wekî ku tê zanîn di zaravaya Soranî de zayenda di şiklê qertafan de tune ye (bnr: Berbang, 2004: 31). Ji vî aliyê ve Soranî wek zimanê Farisî ye. Ev yek dibe ku ji bandora Farisî be. Hin peyv hene ku wek bêje di nav xwe de zayendê nahewînin. Muellif di rewşên weha de rasterast zayenda wan bi peyvên “nêr û mê”yê nivîsandiye. Ev yek jî bi rêya terkîban saz kiriye. Bo mînak peyvên nêtar weha îzah kirine:

1/64 Xurûf belê **berx-î nêr** e
Xurûfet mê ye dirgîm şêr e

2/137 Qunfuz jûşk e ye'qûb **kew-i nêr**
Sumeydi' û sîd hem gurg şêr şêr

Muellif jî, ji ber ku Soran e û berhema xwe bi Erebi-Kurdiya Soranî nivîsandiye, di berhemê de wek qertaf zayendê em nabînin. Di vê rewşê de, muellif serî li zayenda Erebi daye û zayenda bêjeyan bi wî awayê diyar kiriye. Mînak:

2/55 Mişbah û nîras û sirac çira ye
Şeqîqet xuşk e **şeqîq** bira ye

2/48 Sekan kêrdger sikkîn kêrd e

Hefîlet jin helîl mêrd e

Di Kurdî de hin peyv hene ku zayenda wan bi rêya pêşgiran diyar dibe. Gava zayenda heywanên mê tê gotin, ev şiklê zayendê tê bikaranîn. Mînak:

2/123 Sarix keleşîr e şewhet kolar e

Lebwet **dêleşîr** şinf kuwar e

3.3.4. Pirjimarî û Yekjimarî

Di zaravaya Soranî de wek ya Kurmancî yekjimarî di nav qertafan de cih digire. Di rewşa ravekan de ev yek derdikeve pêş (bnr: Berbang, 2004: 31). Di ferhengê de yekjimarî û pirjimariya Soranî qet derbas nabe. Ji dêvla wê, muellif qertafên Erebi û Farisî bikarînane. Ji Erebi peyva “cem” û ji Farisî qertafa “ha”yê ji bo pirjimariyê bikarînane. Di Erebi de cem‘a mu‘ennesa salim, bi rêya qertafa “at/ad”ê çêdibe. Ev jî, ji bo peyvên mê tê bikaranîn (Ermiş, 2007: 132). Di ferhengê de weha derbas dibe:

2/19 Seb‘ûn seb‘în heftad e

Weted mêx e cemî‘ ewtad e

Cem‘a muzekkera salim, bi rêya qertafa “în” û “ûn”ê çêdibe (Ermiş, 141). Ev yek jî ji bo peyvên nêr tê bikaranîn. Di ferhengê de zayenda nêr ya Erebi weha derbas dibe:

1/105 Di‘ame sarîye sutûn

Qern şax e cemhî qurûn

Qertafên Farisî yên pirjimariyê jî du lib in. “an” û “ha” ne, an jixwe ji aliyê Soranan ve jî tê bikaranîn, lê di ferhengê de “an” nehatiye bikaranîn. Ji Farisî qertafa “ha”yê hatiye bikaranîn û di berhemê de weha ye:

3/4 Xeyl cemi‘ espha û suwareha

Keyl pîwan wezn kêşan fek zar

3.3.5. Hevok

Di ferhengê de hevok gelekî nehatine bikaranîn. Tenê di malikekê de hevokek Erebi di risteyekê de derbas dibe û di heman risteyê de Soraniya wê jî hatiye dayîn. Ji bilî vê, wek hevok em rastî lêkeran nayên. Hevok tê wateya “tu çi dikî” û di ferhengê weha cih digire:

1/134 Huna lêre şeme lewê

Mazatûrêdo çit dewê

3.3.6. Qertaf

Muellif di mijara qertafan de ji sê zimanan îstifade kiriye. Ziman, Erebî, Kurdî/Soranî û Farisî ne. Qertafên pirjimariyê yê Erebî gelekî bikaranîne. Ji Farisî jî hem qertafa pirjimariyê hem jî qertafa kesandinê “est”a Farisî bikarînaye. Emilandina sê zimanan wê yekê nîşan dide ku, muellif hersê ziman zanîbûne ku li gorî peyvan ev hersê ziman emilandine. Qertafên pirjimariyê di sernavê jor de me dabû, ji ber hindê em wan dubare nakin. “Est”a Farisî di ferhengê de weha derbas dibe:

3/23 Zewc buwed şewher û zewce jin e
Tîlh û qurad **est** be Kurdî gene

Di herdu nusxeyan de malikek cuda hatiye bikaranîn. Di nusxeya bi navê *Kitab-u Ehmediye*”yê de peyva “dibêjin” derbas dibe û di nusxeya bi navê *Luxetnamey Ehmedî* de heman peyv “du bêjin” derbas dibe. Gava em li gorî nusxeya *Kitab-u Ehmediye*”yê lê binêrin em dikarin bibêjin ku muellif qertafa dema niha ya Kurmancî “di” bikaraniye, lê nusxeya din vê yekê piştrast nake. Malik di herdu nusxeyan de weha derbas dibe:

Çirbal û minxel her **du bêjin**
Bewey çîştî pê debêjin. (Şêx Merûfê Nodê, 28)

2/45 Çirbal û munxel **dibêjin**
Be wî çitî pî debêjin

3.3.7. Lêker

Di ferhengê de zêde lêker nehatine bikaranîn. Şêx Merûfê Nodeyî di nusxeya bi navê *Luxetnamey Ehmedî* de di beşa destpêkê de gotiye berhem ji du bab ango ji du beşan pêk tê. Beşek ji navdêran û yek ji lêkeran (Nodê, 3). Lê di beşa lêkeran de Nodeyî zêde lêker bikar neanîne. Di destpêkê de gotiye du cureyên lêkeran cih digirin. Cureyek lêkerên dema boriya diyar û yê din jî lêkerên dema niha.

a) **Lêkerên Xwerû:** Lêkerên herî zêde derbas dibin ji vê beşê ne. Ev lêker di nava berhemê de weha derbas dibin.

1/33 Reqebe ‘ebd û gerden e
Heyat jîn e mewt **mirdin** e

Lêkerên xwerû ev in:

“Were, mirdin, merg, nustin, dewê, bêj (debêjin), barîn, durûn, delê, dero, pero, westa (westîn), nusîn, bistî (bihîstin), tersa, bestî (girtî), doşî (dotin), noşî (vexwarin), reştî, zanî, şuştî, bûn, malî, xuwardî, rîstî, nuwarî, pêway, çandî, pirsî (pirsîn)”.

b) Lêkerên Dariştî: Ev cureya lêkeran ji pêşgir û paşgiran çêdibin (Tan, 2000: 101). Ev lêker di ferhengê de kêr derbas dibin. Mînak:

3/75 Qe‘ede **danîşt** celese eyden
‘Ebere **raburd** weqefe westa

Lêkerên dariştî ev in:

“Danîşt, raburd, lêda (lêdan), nehiştin”.

c) Lêkerên Hevedudanî: Ev lêker bi rêya du peyvyan derdikevin holê. Herdu peyv jî bi tena serê xwe xwedî wate ne û dema tîm cem hev wateyek nû saz dikin. Ev lêker jî wekî lêkerên pêkhatî gelek kêr derbas dibin. Mînak:

3/60 Sebeq **pêşkewt** nezer newarî
Exeze girtî ekel xuwardî

Lêkerên hevedudanî ev in:

“Pêşkewt, lewmekerd, daykend, duwikewt”.

3.4. Cudahiyên di Navbera Luxetnamey Ehmedî û Kitab-u Ehmediyye’ê de

3.4.1. Destpêk

Wekî tê zanîn di edebiyata klasîk de di nivîsandina menzûmeyan de hertim bi navê Xwedê dest pê tê kirin. An jî ji dêvla wê bi “Bismila”yê destpê dikin. Di beşa destpêkê de armanc tê nivîsîn û di vê rêyê de alikarî ji Xwedê tê xwastin. Wekî numûne destpêka Nubihara Biçkan weha ye:

Bismillahîrehmanirrahîm

Mebdeê her ilmekî navê ‘Elîm. (Pertev, 28-9)

Di destpêka *Luxetnamey Ehmedî* de navê Xwedê û wêfên Wî derbas dibin lê di *Kitab-u Ehmediye’yê* de ev yek di nav menzûmeyê derbas nabe. Di serî de “Bismillahîrehmanirrahîm” hatiye nivîsîn lê wekî me gotî, ev yek ji derveyî menzûmeyê ye, lewra di nav malikan de cih nagire. Lê di destpêka *Luxetnamey Ehmedî* de ev derbas dibin.

Be nam Xuday Heyy la yemût

Perwerdigar-i mulk û melekût. (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 3)

3.4.2. Sebebê Telif

Ev beş di menzûmeyan de ango nivîsên bi şiklê mesnewiyan hatî nivîsîn de wekî “sebebê tertîb, sebebê werger, sebebê tehrîr” (Haksever, 1999: 56) derbas dibe. Şair di vir de sedema nivîsandina xwe diyar dike. Beşa bi tamamî aîdê şair ev e. Lewra cîhana hîs û ramanên şair (Önal, 2007: 107) di vir derbas dibe. Di ferhengên menzûm de bi gelemperî ev beş kêm zêde wekî hev in. Şair sedema nivîsandina xwe, wekî fêkirina zarokan ya bi zimanekî diyar dikin. Ev yek di *Luxetnamey Ehmedî* de derbas dibe lê ji ber ku her sêzde malikên destpêkê di *Kitab-u Ehmediye*’yê de derbas nabin em vê beşê di *Kitab-u Ehmediye*’yê de nabînin. Di *Luxetnamey Ehmedî* de weha ye:

Der î n risale be Kurdî zeban

Konem zeban ‘Ereb ra beyan

Ta ke ferzendum Ehmed bî te’eb

Şeved danay luxat ‘Ereb

Lî haza nawem na Ehmediye

Wellahe ercû islah el-niyye. (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 2013: 3)

3.4.3. Serenav, Beş û Malik

Di herdu nusxeyan de serenav, beş û malik ji hev cuda ne. Di nusxeya bi navê *Luxetnamey Ehmedî* de du beş û çar qit’e cih digirin. Di *Kitab-u Ehmediye*’yê de destpêk bînavê û di nav metnê de du nav hene.

Di *Luxetnamey Ehmedî* de beşa yekem bi navê “beşî yekem le wergîranî nawekanda” ye û ji malika (malik) yekem destpê dike heta malika 292an dewam dike (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 4-41). Qit’eya yekem ji malika 293an destpê dike heta malika 313an (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 41-3). Qit’eya duyem ji malika 314an destpê dike heta malika 320an (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 43-4). Qit’eya sêyem ji malika 321an destpê dike heta malika 324an (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 45). Qit’eya çarem ji malika 325an destpê dike heta malika 353an (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 45-9), beşa duyem bi navê “el-bab-i el-sanî fî terceme el-fi’al” derbas dibe û ji malika 354an destpê dike heta malika 370î (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 49-51). Her sêzde malikên ewil yê di *Luxetnamey Ehmedî* de weha ne:

Be nami Xuday Heyy la yemût
Perwerdigar-i mulk û melekût

Elhemdulillah-i elî ma weheb
Medana ilmî lisan-i ‘Ereb

Selat û selam-i bî hed û hesab
Ber Muhemmed bad hem û al û esheb

Û be’ d bidan çunîn mîgoyed
Merûf bin Mistofî bin Ehmed

Qedhe fehullahu bî eltafîhî
We ebeweyhî keeslafîhî

Der î n risale be Kurdî zeban
Konem zeban ‘Ereb ra beyan

Ta ke ferzendam Ehmed bî te’ eb
Şevd danay luxat ‘Ereb

Lî haza nawem na Ehmediye
Wellahe ercû islah el-niyye

Be du bab kitab mîşewed kemal
Yek bab-i esma yek bab-i efa’l

Zîr her ismî mîkonem tehrîr
Ceme’ş yek bûd ya du ya kesîr

Der bab-i efa’l miyan heme
Fi’il mazî ra konem tercume

Zîr her fi'îlî mîkonem teqrîr
Muzarî û mesder kem bî ya kesîr

Rebbî wefiqnî we xuzyedî

Wenfebiha talibel mubtedî. (Şêx Merûfê Nodê, 2013: 3)

Di *Kitab-u Ehmediye*'yê de destpêk bênav e û ji malika yekem destpê dike heta malika 141, pişt re serenavek derdikeve û bi navê “Esmâ-ul Eded” derbas dibe. Ew jî, ji malika 142an destpê dike heta malika 277an. Piştî vî sernavî navek din wekî “Qit'eta Axir” derbas dibe û ew jî, ji malika 278an destpê dike heta 354an. Di vê nusxeyê şanzde malik kêr hatine. Lewra di nusxeya bi navê *Luxetnamey Ehmedî* de ji xeynî her sêzdeyên destpêkê 370 malik hene, di *Kitab-u Ehmediye*'yê de destpêk jixwe tune ye û malik jî 354 lib in.

3.4.4. Ziman û Guherîn

Ji ber ku xebata me li ser *Kitab-u Ehmediye*'yê ye, em dê dibin vî sernavî de li ser zimanê wê nusxeyê nesekinin. Zimanê wê nusxeyê di beşên jor de bi awayekî berfireh hate tehlîl kirin. Di vî sernavî de em dê li ser cudahiya zimanê herdu nusxeyan bisekinin.

Di navbera herdu nusxeyan de ji aliyê deng, peyv û risteyan ve cudahî hene. Di hin malikan de deng hatine guhertin an jî, cihê du dengan hatiye guhertin. Ev yek bi gelemperî di navbera dengên wekî “s-z, b-m, p-b” yanî di navbera tîpên nêzdeng de çêbûye. Ji bilî van di hin peyvên de deng hatine lê zêde kirin. Numûne:

Luxetnamey Ehmedî

Sexur **didan**-i pêşî ne
Buxd û zixn û şexna qîne.
(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 9)

Kitab-u Ehmediye

1/31 Şexur **dundan**-i pêşî ne
Buğd û zîgn û şexina qîn e

Di malikan de peyv an lê zêde bûne an jî jê kêr bûne. Ev yek di gelek malikan de dixuyê. Peyvên wekî “çi ye, hem, sîye” di hinekan de nînin, di hinekan de hene. Lê ya ji vî zêdetir ew e ku di hin deran de peyv bi temamî hatine guhertin. Peyv li ser heman wateyê bin jî ziman cuda ye:

Luxetnamey Ehmedî

Kesîb çî? tepolke ye lîv e
Nudar **altun** luceyn zîv e.
(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 13)

Kitab-u Ehmediye

1/73 Keşîb tepolke ye lîv e
Nuđar **zêr** e luceyn zîv e

Di malikan de dengên wekî “kekeşêr-keleşêr, sik-zik, hirem-herim, selat-selût, leyl-leyle, dirm-direm, şebnum-şebnem, dêr e-nêr e, zebre-zore, kuliye-kileye, lep-leb” bi hev hatine guhertin, an hatine zêde kirin, di hin malikan de peyvên wekî “altun-zêr, ne’ce-zan” bi temamî hatine guhertin.

Di navbera herdu nusxeyan de hin malikên hinek ristiyên wan hatî guhertin hene, lê ev guhertin ne li ser tîp û peyvekê ye. Li ser çend peyvan guhertin hatine kirin. Di malikekê de risteyek bi temanî hatiye guhertin. Ev yek wê gumanê di hişê mirov de diafirîne ku ev herdu nusxe, ne ji aliyê kesekî ve hatibin nivîsîn. Piştî serenavên cuda ev rewşa ku tê xuyan vê gumanê piştrasttir dike. Lewra di bikaranîna qertafan de cudahî ketine nava herdu metnan. Wekî numûne di hin malikan de qertafa Farisî “est” hatiye bikaranîn. Ji bo malikên çend peyv û risteyek wan hatî guhertin em dikarin li çend mînakên binêrin:

Luxetnamey Ehmedî

Kelîl **şimşîrî dem panî** kul e

Fereş pepûle ceradet kule.

(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 32)

Ji bo malika ku risteyek bi temamî hatî guhertin:

Luxetnamey Ehmedî

Meter xeys û cûd heya baran e

Xerîf paîze şita zistane.

(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 33)

Kitab-u Ehmediye

2/74 Kelîl **û naî keltix** kul e

Fereş pepûle ceradet kule

Kitab-u Ehmediye

2/80 Meter xeys û cûd heya baran e

Şebeket daw e xaret talan e

Jixwe di navbera ziman û kelîmeyên herduyan de hin cudahiyên berbiçav hene. Hejmara malikên herdu nusxeyan ji hevdu nagirin. Mustensîxê ku nusxeya bi navê *Kitab-u Ehmediye*’yê nivîsî çend malik ji nusxeya din nenivîsîne. Ev malik weha ne:

Rekiye çi ye? ismî bîre

Hisr, heyser, heysar şîre

Esl gewre fer’ biçûk

Melik paşa cem’î mulûk

Suhd û suhad û ereq bêxew e

Nahil laxerî semîn qelewî

Serî reften şeb celî rûşen est
Xefî win xemîs ey pêser qeşûn est

Subhet tezbîh serr bay sext e
Neyy çî kal e nesîc puxte

Cele gêray ebî neyhêşt
Qedim matu qete' birrî.

(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 5-12-35-37-45-47-51)

Di wê navberê de hin malik jî tevlîhev bûne. Mustensîx du malikên ku li ser hev tîn tevlîhev kirine û risteyek ji malikekê standiye û risteya din jî ji malika din wergirtiye. Ev malik di herdu nusxeyan de weha derbas dibin:

Luxetnamey Ehmedî

Feqr û udm û iqlal faq e
E'tûd karjele selwî şîlaq e
Qurbet tae't e qirbet kunde ye
Remeq diwa giyan e'bd bende ye.

(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 40)

Kitab-u Ehmediye

2/134 Qurbet ta'et qirbet çî? gunde ye
Feqîrî u'dm iqbal faq e

3.4.5. Behr, Wezn û Qafiye

Di herdu nusxeyan de heman behrên erûzê hatine bikaranîn. Di herduyan de jî çar behr cih digirin. Remezan Pertev behrên wê wekî “Remel-Hezec-Munserih-Muteqarib” dîtine (Pertev, 30) lê behrên wê “Remel-Hecez-Serî-Muteqarib” in.

Remel: wek fai'latun, fai'latun, fa'ûl derbas dibe, lê wezna wê gelekî xirab e tam dernakeve. Kîte kê m û zêde derdikevin di malikan de.

Luxetnamey Ehmedî

Bab derga i'qd gerdên-i bend-i dûr
Tirf cuwanû zur dukme zaq tar.

(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 41)

Kitab-u Ehmediye

3/4 Xeyl cemi' espha û suwareha
Keyl pîwan wezn kêşan fek zar

Hezec: Ev behr wek “mefai'lun, mefaî'lun, feû'l” derbas dibe. Wezna vê behrê ji ya behra remelê hindikî baştir e, lê dîsa neserketî ye.

Luxetnamey Ehmedî

Welûd zayinde e'qîm nezok e
Zukam helamet su'al çi? koke.
(Şêx Merûfê Nodê, 2013: 36)

Kitab-u Ehmediye

2/112 Ğemame hewr e wekfet dulop e
'Urf 'eṭaya 'urf û aldîk po ye

Muteqarib: Ev behr li gorî behrên din baş e, di vê de jî xirabûn gelek in lê li gorî wan dîsa baştir e. Tefîleya wê wekî “fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl” derbas dibe.

Serî': Behra serî'ê di metnê de “muftê'ilun, muftê'ilun, fe'ûl” derbas dibe lê ev jî ne bêqusûr e. carinan kîteyên pêşiyê ji hev bigirin yên duyem nagirin an jî di nav metnê kîteyên din ji hev nagirin. Ji hêla tefîleyê û dîtina wê ve her çar behrên erûzê pirsgirêkê derdixin.

